


## Zarezara daran

Darên Efrînê dikin zarezar hê jî li bazara talanê. Pelên wan dibin xwelî û bi ser serê mirovahiyê de diweşin. Darzeytûnên Efrînê ev çend sal in tên kişkişandin bi erdê ve ji Efrînê heta Enqereyê û nizanim ku derê... Zeytûn dimirin, çivîkên ku wextekî li ser wan... ***Mizgîn Ronak / R.2***



## Ji kûçikan û îtalyanan re qedexe ye

Nijadperestî, baweriyek e ku hin komên mirovan li gora xuyangên xwe yên dîtbarî û nijada xwe, li gora mirovên dîtir xwe mezin, ciyawaz û taybet dihesibînin. Ji ber vê ciyawaziyê jî, pêşdarazî, cihêkarî û dijminantiyek li hemberî yên... ***Yaqob Tilermenî /R.8***



## Dinya bê merdim zî dinya ya

Emrê merdimî goreba dinya çîyêk nîyo. Emrê dinya 4,5 milyar serrî yo, emrê merdimî 200 hezar serrî yo. Dinya ra zî çîyê pîlî estî. Aye zî galaksî ya. Mîlyaran serran ra dima dinya tebîetêk hususî virazîya... ***Av.Cemîla Turhallî / R.9***

# xwebûn

19-25 TÎRMEH 2021 HEJMAR: 83 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

## Başûrê Kurdistanê di sêgoşeyê de ye

Piştî têkçûna referandûma serxwebûnê - yeka Başûrê Kurdistanê nebû dudo. Gelek lîstikên qirêj li ser Başûr tên meşandin. Di van hemû lîstikên qirêj ê dijminên kurdan de agahî ango tiliya malbata Barzanî jî heye. Bêguman şaş e ku mirov hemû Başûr têxe bin tawanbariyekê, bes ji ber ku malbata Barzanî Başûr bi rê ve dibin, êdî Başûr ketiye sêgoşeya dewleta tirk, dewleta Iraq û Malbata Barzanî. Bi niyeta serxwebûna referandûm dest pê kirin di dawiyê de hate astekê ku hemû hêza xwe jî ji dest wenda kir. Balafirgeh û cihên herî stratejîk dewleta Iraqê deste ser kir... **Siyamed Sîpan** ***/ R.6***




## Muhatabo yewin birêz Ocalan o

Yew serrî yanî aşma tebaxe ya 2020î ra nata ma sey DBP, TJA, HDP, KCDyî dest bi na xebate kerdî. Nizdîyo yew serrî yo ke ma na xebate rayra benî. Na xebate de amacê ma yewbîyayîşê şarê kurd û Kurdistanî yo, wedarnayîşê tecrîdê serê birêz Ocalanî û şexsê ê de tecrîdê serê şarê kurdî yo. Reyna grevê vêşanîye û zilm û zordarîyê serê partî, sîyasetmedar û dezgeyanê ma yo. Ma şar reyde seba nê mijaran ameyî têreyde û yenê têreyde. Sewbîna şar qala têkilîya PDK û Tirkîya zî keno û nêrazîbîyayîşanê xo ma rê vajeno. 40 serrî yo ke ma seba ziwan, kultur, erd, statuyê xo têkoşîn danê û ma têkoşîndayîşî de xeylê bedêlanê giranan da. Rexneyan de şar vano ke ma yewbîyayîşê xo pê ardo la sîyasetmedarê kurdan hema yewbîyayîşê xo pê nêardî. Ma waşt ke şarê xo ra pêşnîyaran bigêrî. Şar têkilîya PDK û Tirkîya ra nêrazîyo. Ganî kurdî çar parçeyê Kurdistanî de sey şarêko azad bicuyî. No heqêqo meşru yo. Şarê kurd her cayê dinya de yeno zanayene. ***Roportaj: Nevîn Alkan /R.4***

# 19ê temmuze pawitişê erjan o

19ê temmuza 2012î de Kobanê rojêka tarîxî rê şahîdî kerd û serkêşîya destronayîşê awanîyanê hukmatê Sûrîye bî. Verva sîstemê kapîtalîst ke Rojhelatê Mîyanênî de xetimîyabî, kurd û kurdistanijî alternatîfan awan kerdî. Heme kesê ke şîyî Rojava û şoriş de ca girewt, mat mendî. Şorişî reyde omudê awankerdişê cuwîyeyêka newe vejîya werte. ***Helîn Uzel/R.9***



## 19'ê Tîrmehê şoreşa gelan e

19'ê Tîrmehê şoreşa gelan e. Çirûskên Şoreşa 19'ê tîrmehê di 2012'yan de bi pêşengtiya jinan li bajarê Kobanê vêketin û bi beşdarbûna hemû pêkhateyên herêmê li tevahiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bûn. Şoreşa Rojava di pêvajoya deh salan de têkoşîn û berxwedan nîşan da û di hemû qadên siyasî, aborî û çandî de jî serkeftinên mezin pêk anîn.

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Ednan Kalo diyar kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê ku li Kobanê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir xewnên her ferdekê/î azad bi cih anîn û wiha got: "Şoreşa Rojava berovajî şoreşa bi navê Buhara Ereban e ku li Sûriyê 2011'an dest pê kir. Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi derxistina rejîma Baas'ê dest pê kir. Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa gel e. Şoreşa Rojava li ser bingeha cihêwaziya pêkhateyên... ***R.3***

## YNK û PDK'ê çawa li berjewendiyan dinêre

Partiyên desthilatdar ên Herêma Kurdistanê û bi taybet her du partî, Yekitiya Niştimanî ya Kurdistan (YNK) û Partiya Demokrat a Kurdistan (PDK) gel weke kole dibînin ku bi hezaran ji bo azadiya Kurdistanê û serweriya wê şehîd dane û tu carî bi gel nafikirin û tiştekî jêre pêşkêş nakin. Gel jî weke gotina pêşiyan "berf heliya û mêrg xweya bû", êdî rastiya YNK'ê û PDK'ê nas dike û van her du partiyan gelek caran gel li paş xwe hiştin. Bi taybet piştî komkujiya Helebçe û Enfalan di salên 80'yî û 90'î yên sedsala borî de û herî dawî jî li Şengalê piştî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê di tebaxa 2014'an de.... ***Serdem Silo / R.7***

## 'Vekirina goran kiryarên DAIŞ'ê ne'

Tirkiyê di bin navê "Tevgera Şaxê Zeytûnê" di 20'ê çileya 2018'an de êrîş bir ser Efrînê û di meha adarê de bajêr ket destê komên çekdar ên bi ser Tirkiyê ve. Tirkiyeyê Goristana Avestayê xera kir û cenazeyên aydê endamên YPG, YPJ'ê û sivîlan jê derxist. Cenazeyên li goristanê veşartîbûn, di êrîşên hewayî yên Tirkiyê de jiyana xwe ji dest dabûn. Ajansa Anadoluyê (AA) îdia kir ku "gora komî". Lê derket holê ku ev Goristana Avestayê ye û şervan û sivîl li vir hatine veşartin.

Komên çete yên girêdayî Tirkiyeyê li Efrînê goreke cenazeyên 35 kesan dît û îdia kirin ku ew kes beriya dagirkirina Efrînê ji aliyê... ***R.3***

## Em ê mezin hez bikin

Di van demên dawî de pir difikirim. Gelo rojane di bin navê eşqê de çiqas keç û xort xwe dikujin an jî çiqas tên xapandin. Ji bo mirov bikaribe şiroveyeke têrker û fêmbar bike pêwîst e destpêkê bi hûrgiliyên wê ve em bikaribin evînê fam bikin û nîqaş bikin. Gelo evîn tenê di navbera du kesan de dikare were jiyîn? Gelo evînek şaş dikare koletiyê pêş bixe? Gelo evînek şaş mirov bê vîn dihêle yan na? Pirsa herî zêde dide fikirandin jî ya ku di bin navê eşqê de tê kuştin an jî tê... ***Roja Welat / R.2***



## Kurdên cîhana dêrîn; hatîtî-hîtîtî

Bê çawa şik ji kurdbûyina kurdekî kelhor, goran, soran, kurmanc, zaza ter tune ye. Şik û guman ji kurdbûyina yekî hîtîtî re jî tune ye. Ger hûn vê nivîsê û berdawamiya wê bixwînin... ***R.12***

## Em çima ne pîşesaz in?

Em civateke rêncber in. Pîşesazî layîqî me ye. Û em dikarin vî gewherî zeft bikin. Wekî tê zanîn warê kurdan rengîn e. Çiyayên bilind, gelî û newalên kûr, deştên bêsînor, avzêyên çem û rûbaran kar û barekî hêja û girîng daye ser milê me kurdan. Ji bo her cûre sewalvaniyê cih û warên zengîn hene. Her wiha ji bo çandiniya dexl û dan, bax û bostan û dar û beran jî derfetên bêhempa hene. Kal û bavên me jîr û jêhatî bûn. Bi destekî di navbera deşt û zozan de koç kirine û xwedîkirina sewalan re şev û roja xwe derbas kirine. Bi destekê jî di nav zevî, bax û bostanan dekeda dest û milan dane, xwêdana eniya xwe rijandine. Jiyaneke du bineyî her gav bûye warê bicihbûnê. Geh konên zozanan, geh jî xaniyên gund li gor demsalan malovanî kiriye. Amûr û alavên her malê li gor xebatên zemîn û zeman. ***Ehmed Pelda / R.7***


# Em ê mezin hez bikin

Roja Welat

Di van demên dawî de pir difikirim. Gelo rojane di bin navê eşqê de çiqas keç û xort xwe dikujin an jî çiqas tên xapandin. Ji bo mirov bikaribe şiroveyeke têrker û fêmbar bike pêwîst e destpêkê bi hûrguliyên wê ve em bikaribin evînê fam bikin û nîqaş bikin.

Gelo evîn tenê di navbera du kesan de dikare were jiyîn? Gelo evînek şaş dikare koletiyê pêş bixe? Gelo evînek şaş mirov bê vîn dihêle yan na? Pirsa herî zêde dide fikirandin jî ya ku di bin navê eşqê de tê kuştin an jî tê tecawizkirin çima her tim jin in.

Bi sedan pirsên wiha mirov dikare rêz bike. Em hinekî li ser hestan bifikirin



**Gelo evîn tenê di navbera du kesan de dikare were jiyîn? Gelo evînek şaş dikare koletiyê pêş bixe? Gelo evînek şaş mirov bê vîn dihêle yan na?**

û binivisin. Hezkirin, coş, kelecan, hêrs, xemgînî û hwd. gelek hestên cuda hene. Li gorî fikra min a ku mirov dike mirov jî ev hest in. Lê gelo hestên me polîtîk in an jî çiqas bi korîtî van hestan dijîn? Evîn bi navek din hezkirin di nava van hestan de cihê xwe digire. Lê mixabin li şûna hezkirinê xulamtî û koletî tê jiyîn.

Di rastiyê de hezkirin hestekî wisa ye ku ji bo kes an jî heyîna ku jê tê hezkirin têkoşînê, hewldanê; di heman demê de bi hewldanê re zanebûnê dixwaze. Ez dikarim ji kulîlkekî, ji welatekî yan jî ji xeyalekê hez bikim. Heskirina min çiqas zêde be parastin an hewldana bidestxistina wan jî ewqas zêde dibe. Di heman demê de têkoşîna mirovan derbasî merheleyeke jortir dibe.

Hezkirin di destpêkê de rêzdayîn, keddayîn, vîn û zanabûnê dixwaze. Di roja îro de hezkirin çawa tê jiyîn? Xapandin, kuştin, kolekirin, aidiyet, desthilatdarî, ezezîtî, êrîşkirina li ser vîn, nirx û azadiya jinan e. Tê hezkirin tê kuştin, tê hezkirin tê tecawizkirin, tê hezkirin bê azadî tê hiştin, tê hezkirin rûmeta wê tê şikandin. Ya Star ev çi hezkirin e? Mîna civakê evîn jî di nav pencê qirkirinê de maye. Çawa ku di her mijarê de pergala kapîtalîst guhertinên neyînî di nav civakê de daye avakirin, di mijara evîn û hezkirinê de jî têkçûnek daye avakirin.

Bi şîroveyeke hin cudatir ehmeqtî û zalimtiya mezin tê jiyîn. Gelo wê têkoşîna me ya li beramberî van êrîşan çawa be? Me di destpêkê de qala polîtîkkirina hestan kiribû. Bi pênaseyeke din şêwazê rêxistinkirin û rêvebirina hestan e. Li beramberî bûyer an jî kesayetan ne hestyarî, şêwazekî aqilan e û pir birêgez tevgerandin erka jinan a sereke ye. Her ku pergala kapîtalîst hewl dide di şexsê civakê de jinan bikişîne nav bêpîvaniya jiyaneke sexte, em ***JIN*** li dijberî vê, xwe birêxistin bikin, bibin evîndarê azadiyê. Em ê mezin hez bikin û mezin têbikoşin. Li diji zilamtî-zalimtî desthilatdariyê em ê mezin hez bikin û keç û xortên azad biafirînin. Mina Edûlê-Derwêş û Mem-Zîn. Dê Zîn û Edûlê bibin welat. Derwêş û Mem jî bibin evîndarên wê û ji bo wê têbikoşin. Heya nebin layiqê evîna xwe dê evînê ji bo xwe heq nebînin. Wê demê dê eşq ji nû ve qutsiyeta xwe qezenc bike. Nivîsa xwe bi gotina zanayê mezin bi dawi bikin bawer im dê hîn watedar be: ***HEQÎQET EŞQ E EŞQ JIYANA AZAD E.***

# Li Şehbayê berxwedana jinên Efrînê

Leyla Lorîn

Têkoşîna tevgera jinên kurd û berxwedana ji bo azadiya jinan, li dijî desthilatiya mêrê kujer, her diçe mezin dibe. Hêviyên lêgerînên azadiya jinan her ku diçe li seranserê cîhanê ji jinan re dibe îlhama têkoşînê. Jinên kurd ên ku xwe bi fikrên Rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan hûnandin û di xwebûnê xwe de israr dikin, her kêlî ji bo wan berxwedan e.

Jinên Efrînê ku koçberî Şehbayê bûne, parçeyeke vê berxwedana bêhempa ne. Ji bo jinên Efrînê her kêliya jiyanê bi berxwedanê derbas dibe. Dîsa her kêliya jiyanê, ji bo xwebûna xwe ya azadiyê di berxwedanê de israr dikin. Ji bo jinên Şehbayê li dijî çete û rejîma Baasê her kêlî têkoşîn e.

**Têkoşîna jinan layîqî vegotinê ye**

Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de behsa berxwedana jinên Efrînê ku di 2018'an de bi plangeriyeke navdewletî û bi destê hevalbendên dewleta tirk, di encama êrîşeke dijwar de ji warên xwe hatin koçberkirin û li Şehba û Til Rifatê bi cih bûn, bikim. Têkoşîna jinên Efrînê bi rastî jî layîqî vegotin û lêkolînê ye.

Piştî bêbextiyeke mezin bajarê azadiyê Efrîn hat dagirkirin. Gelê Efrînê koçberî Şehbayê bûn. Ev nêzî çar sal in di nava koçberiyeke zehmet û ambargoyê de dijîn. Bi van zehmetiyên jiyanê jinên Efrînê her kêlî ji bo jiyaneke azad û rûmet li ber xwe didin. Gelê Efrînê û jinên Efrînê mirovên welatperwer in. Di hafiza civaka jinên Efrînê de, hafizeyeke xurt a axê û çandê heye. Di keda jiyanê de gelek afirîner in. Bi van taybetmendiyên xwe dikarin li her derê jiyanek nû biafirînin.

**Ber konên xwe xemilandin**

Yek ji taybetmendiyên jinên Efrînê, çawa ku xwedî zarokên xwe derdikevin û diparêzin, bi heman awayî wisa nêzî darên zeytûnan û hemû nebatên keskahiyê dibin. Jinên Efrînê ku koçberî Şehbayê bûne, bi darên zeytûnan bi darên fêkî, gul û kulîlkan li ber her konên xwe çandine, konên xwe xemilandine. Weke ku te zanîn herêma Şehbayê, berî sê salan bi şerekî dijwar ên çeteyên DAIŞ'ê derbas bû û heta niha jî rojane di bin topbarana çeteyan de dijîn lê bi keda jinên Efrînê carek din li vê heremê jiyanê diafirînin. Lê jinên me yên berxwedêr ji bo nêzî erdnîgariya Efrînê bijîn, di bin van êrîşên çeteyan de jiyaneke zehmet li Şehbayê dijîn. Tevî van hemû êrîş û zehmetiyên jiyanê jî bi dest û keda jinan, Şehba bûye herêmeke keskahî û li ber her konek a berxwedanê baxçeyeke ji gul û kulîlkan hatiye çêkirin. Jinên Efrînê xwedî çandeke resen û xwezayî ne.

**Xwe bi rêxistin kirin**

Her kêliya jiyanê ji bo jinên Efrînê, di nava koçberiyê de zehmet û bi êş derbas bibe jî ew xwedî vîneke bihêz in û bi vîna berxwedana jinên kurd, serî li hemberî zor û zehmetiyan natewînin. Berî ku Efrînê dagirkirin, Efrîn bi hêza jinên azad, pêkhateyên; kurd, ereb, êzidî, sûryan, elewî bi hev re dijiyan. Piştî dagirkeriya Efrînê, şêniyên Efrînê derbasî Şehbayê bûn, tevî zext û zehmetiyan xwe zû komî ser hev kirin, rêxistina xwe carek din bi pergala hevserokatiyê, xebatên xweser, komîn û meclisên jinan, hêza cewherî rêxistin kirin. Jinên Efrînê bi fikrên Ocalan, xwe di bin sîwana Pergala Neteweya Demokratîk de, bi vîn û nêrîna jinên azad, ji bo guherandina civakê û azadiya jinan jî pêşengtiyê dikin.

**Çîrokên jinên Efrînê**

Bi van mijarên ku me girtin dest, piştî dagirkeriya Efrînê çîrokên jinan ên gelek biêş jî hene. Di nava her malbatekê de dayik û jin xwedî çîrok û serpêhatiyên biêş in. Şerê dagirkeriya Efrînê û berxwedana 58 rojan êşeke mezin ji bo jin û dayikên Efrînê hişt. Hîn jî şerê dagirkeriyê li welatê wan xilas nebûye û metirsiyên mezin li ser jiyana şêniyên Efrînê û jinan heye. Bi hezaran dayikên efrînî di berxwedana 58 rojan de xortên xwe û keçên xwe winda kirin. Gelek serpêhatiyen jin ên ku hevjînên xwe di berxwedana Efrînê de winda kirin, hene. Dîsa gelek dayik û jin hene zarokên wan bûne gazî, yên ku destê wan qut bûne, çavê wan çûne, lingê wan çûne, di nava van çîrok û serpêhatiyên jinên Efrînê de li benda nivîsandinê ne. Lewra hêja ye ku hemû cihan vî dengê berxwedana jinên Efrînê bibihîse. Her çiqas çîrok û serpêhatiyan ku dilê jinan û dayikan bi êşê koçberiyê disote jî lê jinên Efrîna berxwedêr dibêjin 'Heta rizgariyê em dev ji têkoşîn û berxwedana xwe bernadin.'

Weke rayagiştî ya cîhanê jî dizane jinên kurd û jinên şervan ên Rojava ji bo cîhanê li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer kir û mirovatî û jinan ji metirsiyên çeteyên hov ên DAIŞ'ê rizgar kirin. Hemû jinên cîhanê û gelê cîhanê deyndarê jinên kurd û şervanên jin ên kurd in. Divê civaka navneteweyî ji bo azadî û mafê gelê Efrînê berpisyariyên xwe bi cih bînin. Tenê daxwazeke jinên Efrînê heye, di nav azadiyê de carek din vegerin ser axa xwe, vegerin welat û cih û warên xwe. Bi vê wesîleyê jinên Efrînê bi biryar in dê dijî hemû ferasetên komê çeteyan ku jinan di nav Efrînê de dixe kole, li ber xwe bide û têbikoşe.



Mizgîn Ronak

# Zarezara daran

Darên Efrînê dikin zarezar hê jî li bazara talanê. Pelên wan dibin xwelî û bi ser serê mirovahiyê de diweşin. Darzeytûnên Efrînê ev çend sal in tên kişkişandin bi erdê ve ji Efrînê heta Enqereyê û nizanim ku derê... Zeytûn dimirin, çivîkên ku wextekî li ser wan daran stran digotin, dibizdin. Deng tê, deng tê! Dar digirîn, zeytûn û pel, dendikên wan in; bi ser serê me de dibarin. Darzeytûnên Efrînê darbestên çi ne, wiha rêz bi rêz di ber me re derbas dibin bi ku ve diçin? Van darên ku Çiyayê Kurmênc li pişta xwe kirine, me bi ku ve dibin?

Dê ev koçberî heta ku derê here? Pirsên ku me dorpêç kirine bi îşkeîska darên Avaşînê diêşên! Ên Efrînê ne bes bûn, îja yên Avaşînê!

Dar diweşin, dar dimeşin! Dest û ling zincîrkirî, şax şikestî. Desmalên şînê hene li ber çavên wan, Avaşîna şehîdan ji pelên wan dilop dike, dibe baran her tiştî... Gelo yên ku darên Avaşînê neparastin û nehiştin lehengên wan jî biparêzin di çola kîjan şermê de ne niha? Zarezara darên Avaşînê digihîje heta qesr û qonaxên wan ên Sedamî? Gulistana ku pêşkêşî faşîzma tirk dikin nifrînên ji hesin li wan nake gelo? Ev heyranî û qurbaniya ji bo gurên boz ji ku tê, nizanim lê ku wiha bidome dê gulistan bimîne sê parçe ne çar parçe. Dê roj were, hevokek wiha li derdorê bigere: Perçeyê welatê Başûr, Heleb-jan û Hewlêr û Diyala û Selahedîn û Zaxo; li ser tepsiyeke bixwîn pêşkêşê gurên boz kirin û guran wan bi yek carê xwarin! Welat ma sê parçe, welat ma sê parçe!

Niha di vê sibeha bi zarezara darên kuştî û lalbûyî de, ne gotina "xiyanetê" bi kêrî tiştekî tê, ne jî "xwefiroşî" û "birakujî-xwişkkujî." Tu gotin nikare darên Avaşînê yên ku wan wekî cendekên xeyalên xweş rêz bi rêz dikişînin, dixwin û difiroşin rizgar bike. Tu gotin, tu gotin... Min demek berê wiha nivîsîbû di helbestekê de: "Gotin sîxur in/her tiştî dibêjin/lê tu tiştî nabêjin/gotin sîxur in/her tiştî dibêjin/lê tu tiştî napêjin..."

Mînak; bi salan e ku em-ez li ser "kurmên darê" û "girîngiya yekitiyê" dinivîsînim. Lê gotin rastiyê naguherînin û ez êdî ji hesta; te xweş got-nivîsî, wê/wî xweş gotnivîsî hez nakim. Tiştên din lazim in êdî, bagerên nû. Lew; Çira/şev çira ye êdî/venaşêre tu tiştî/ne sir/ne sihir/ne sûretê/romantîk ê li ber dil/Şev çira ye êdî/ her tişt li ber çavan e.

Bi taybetî jî dar li ber çavan in. Li Efrînê tên kuştin, li Stenbolê tên firotin, li Konyayê tên sotin. Li Avaşînê tên birîn, li Amedê dibin birîn, li Mêrdînê dibin girîn. Gelo yên ku "xakî welat" firotin û daran wiha qurban kirin kêfxweş in niha? Çend quriş girtin, çend caran têr xwarin, çend bazar li bejna xwe kirin? Gelo nizanin ku dê darên Avaşînê bi ava xwe ya şîn û sirûda xwe ya serberz tim li pey wan bin û bipirsin: Çima yekane gulistana xwedî statuya fermî ket vî halî?

## Lehiyê zerarek mezin da welatiyan

Li bajarên herêma Serhedê, taviya baranê bandorek neyînî li ser jiyana mirovan kir. Li gundên Hesentemiran, Memedalan û Astecoyê lehî rabû û 50 heywan mirin. Zeviyên çandiniyê jî di bin avê de man.

**WAN:** Li navçeya Elbakê xanî û axurên li herêma Albayrakê zerar dîtin. Hezaz çêbû û 2 kes di qemyonekê de asê man û hatin rizgarkirin. Li navçeya Sarayê şivan Alî Ozlu ji ber brûskê birîndar bû.

**QERS:** Li navçeya Qamuşan a Qersê ji ber baran û zîpikê hin xanî û kargeh di avê de man. Li taxên Înonu, Erenler û Cûmhûriyetê lehiyê xisar da. Li navçeya Qaxizmanê jî lehî rabû. Li gundên Çalli û Qerebaxê xisara madî bû.Li gundê Çalliyê axurek rûxiya û 5 heywan mirin.

**AGIRÎ:** Li navçeya Giyadînê ya Agiriyê ji ber lehiyê rêya bejahî ya ber bi Îranê ve hat girtin. Li gundê Qerebazarê lehî rabû. Xisar li zeviyên çandiniyê bû.

## Demografiya herêmê diguherînin

Piştî hikûmeta Tirkiyeyê axa Efrînê û desteserkirina hin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê desteser kir, bi hevkariya hêzên biyanî yên li herêmê, dest bi guhertina demografiya herêmê kiriye. Hin hêzên ereb û rayedarên tirk, kurdan koçber dikin û li şûna wan hêzên çekdar ên biyanî û malbatên wan li wir bi cih dikin.

Komeleya 'Ereb-Filistîn 48' û komeleya 'El-Eyş Bikerama' û 'Eyadî Beyda' li gundên Elkê û Kefer Rûmê yên navçeya Şerayê avahiyên nû ava dikin. Komeleyên Qatar û Kuweytê di navbera her du gundan de bi sedan darên zeytûnan ji kok ve birîne û ji bo malbatên çeteyan dewsa avahiyên nû vekirine. Komeleyan gundê Qîbare yê şêniyên êzidî ku girêdayî bajarê Efrînê ye ava kiribûn û tenê xelkê Xutayê lê bi cih kiribûn. Heta niha li herêmê 18 avahî hatin avakirin. ***EFRÎN***

## DEDAŞ'ê dîrekê ceyranê rakirin

DEDAŞ, bi hinceta "deynên ceyranê" bi hejmareke zêde cendirmeyan re bi ser gundên navçeya Dêrikê ya Mêrdînê de girt û li gundên Qubilme û Êlaska têlên ceyranê yên birên avê birî û dîrekên ceyranê rakir.

Xebatkarên DEDAŞ'ê têlên ku birîn û dîrekên ku rakirin li qamyonan bar kirin û bi xwe re birin. Cotkar Emrûllah Ayav, diyar kir ku îtîrazî deynên ku DEDAŞ'ê ji wan re derxistiye kirine û pêvajoya dadgehê dane destpêkirin. Ayav, da zanîn ku pêvajoya dadgehê didome. Li dijî kiryarên DEDAŞ'ê jî serlêdana tevdîrê kirine û DEDAŞ û cendirmeyan bi ser wan de girtine.

**Abone dan îcrayê**

DEDAŞ'ê, li Rihayê û navçeyên wê jî aboneyên deyndar dan îcrayê. DEDAŞ'ê 132 hezar û 628 abone dane ber îcrayê. Şîrketê avahî, ticaretxane û kesên erdên avî yên ji sala 2013'an heya niha deynên xwe nedane dane îcrayê û tê gotin deynê aboneyên ketine ber îcrayê bi gişî nêzî 2 milyar TL ye. ***RIHA***

# Ne tên kirîn û ne jî tên firotin

Navenda Nûçeyan

Her sal di Cejna Qurbanê de li bazara sewalan a Yenîkoyê ya Amedê sewalkar konên xwe vedidin û bi boneya Cejna Qurbanê sewalên ku xwedî dikin tînin bazarê û dest bi firotina wan dikin. Sewalkar vê xebat û amadekariyên xwe beriya cejnê temam dikin ku sewalên xwe berî cejnê bifiroşin. Ji ber qeyrana aborî îsal buhayê sewalan gelek zêde ye. Ji ber vê yekê him sewalkar him jî kesên ku dixwazin ji bo cejna qurbanê sewalan bikirin bi zehmetiyan re rû bi rû ne. Di tengezariyê de ne. Têkildarî mijarê me berê xwe da bazara sewalan a Yenîkoyê ya Amedê û bi sewalkar û kesên ku ji bo cejna qurbanê dê sewal bikirin re axivîn.



**'Êdî kare me wekî berê ne baş e'**

Ekrem Şahîn ê ku debara xwe bi sewalkariyê dike diyar kir ku ev 30 sal in ku di nava vî karî de ye. Şahîn anî ziman ku ger ku vî karî neke dê nikaribe debara xwe bike û wiha got: "Her tişt biha bûye. Êm biha ye ceh biha ye, ka biha ye. Heywan jî biha ye. Ev nêzî 30 sal in ez vî karî dikim. Berî îdê (cejn) piştî îdê em tim lê vê derê ne û vî karî dikin. Debara me bi vî karî dibe. Ev kar wekî berê ne baş e. Milet di nav xizaniyê de ye. Qeweta wan têrê nake ku wekî berê ji bo cejna qurbanê heywan bikirin. Fiyeta heywanekî dusê qat zêdeyî maaşê mirovekî teqawît e. Îro mirovekî teqawît 1 hezar û 700-1 hezar û 800 lîra, nastîne. Îro sewalek (qurbanî) fiyeta wî bûye 3 hezar lîra. Bihayê beranekî 4 hezar lîra ye. Bihayê gîskekê 1 hezar-1 hezar û 200 lîra ye."

**'Lêçûna sewalan pir zêde bûye'**

Ekrem Şahîn der barê bihabûna sewalan de wiha axivî: "Li gorî salên berê îsal fiyeta heywanan hinekî din jî zêde bûye. Lê mesrefa heywanan pir biha bûye. Îsal baran û şilî tune bû. Ji ber vê ka biha bû ceh biha bû. Mînak sala borî buhayê tona ceh hezar 500 lîra bû. Îsal jî tona wî bûye 2 hezar û 600 lîra. Buhayê tona kayê hezar û 200 lîra bû. Lê niha tona wê bûye hezar û 800 lîra. Ji ber wê buhayê heywan jî zêde bûye. Mirovên ku derfetên wan hebin tê ji xwe re dikire. Ên ku tune be jî nikarin bikirin. Sala borî min nêzî 100 heywan firotin. Lê îsal firotina heywan kêm e. Ne diyar e ku em ê çiqas bifiroşin. Em li kara zêde nagerin. Bila heywan bên firotin û di stuyê me de nemînin. Em tenê li vê derê nînin hinek rekabet jî heye û em ji bo vê erzan jî difiroşin. Yanî em li kara zêde nagerin. Em dibêjin bila bên firotin."

**'Şaredarî ceza li me dibire'**

Sewalkar Sînan Tîmûçîn jî der heqê zor û zehmetiyên sewalkariyê ku dertên pêşiya wan de ev tişt anî ziman: "Ez debara xwe bi firotina heywanan dikim. Li bazara heywanan a Yenîkoya Amedê heywanên xwe difiroşim. 7 sal in ku ez vî karî dikim. Li gel zor û zehmetiyên vî karî em bi gelek zextan re rû bi rû dimînin. Heta niha jî bo vê qada pazara heywanan tu alîkarî ji me re nehatiye. Em û heywanên xwe li ber tavê nin. Ji bo me cih çênekirine. Em bi derfetên xwe ji bo xwe û ajalên xwe kon datînin. Şaredarî ceza li me dibire. Salên borî ev karê me baş bû. Me dikaribû debara xwe bikira. Lê ev çend sal in ji ber lêçûna sewalan zêde bûye, karê me ne baş e. Îsal baran kêm bariya. Çandiniya ceh, genim û hwd. pir kêm bû. Ji ber vê yekê buhayê ka, ceh û êmê ajalan pir buha ye. Xwedîkirina ajalan pir zehmet bûye. Fiyeta ajalan jî li gor salên berê zêde bûye. Mirov jî ji ber vê nexweşiya koronayê nêzî du sal in bêkar in û her diçe xizan dibin. Qeweta wan têrê nake ku ji bo cejna qurbanê ajalan bikirin."

**Buha zêde ye**

Firat Damgalî yê ku qurbanî kirî jî destnîşan kir ku ew li gorî qeweta xwe car caran ji bo cejna qurbanê heywan dikire û ev tişt got: "Îsal fiyeta heywanan zêde bûye. Min îro qurbaniyek bi hezar û 350 lîrayî kirî. Sê sal berê bûya min ê bi vî pereyî 5 qurbanî bikiriya. Yanî fiyeta heywanan gelekî biha bûye. Li gel vê êm, ka û ceh jî biha ye. Kîloyekî goşt bûye 50 lîra. 10 kîlo goşt 500 lîra ye. Yanî bi her awayî biha ye. Mirov bêkar e. Kar tune ye. Mirov dê çawa goşt bibe mala xwe. Mirov dê çawa goşt bixwin?

Welatiyê ji Kobanê Sadetîn Mihemed jî diyar kir ku fiyetên sewalan pir biha ne û wiha got: "Ez xelkê Kobanê me. Em hatine vir kar û xebat dikin. Dema ku pere di destê me de hebe em ji bo cejna qurbanê heywan dikirin. Min qurbaniyek bi 1 hezar û 250 lîreyî kirî. Ev jî ya herî erzan bû. Yanî fiyetên wan pir biha ne. Qeweta meriv têrê nake ku bikire. Di vê rewşê de him xelk him jî sewalfiroş bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin. Aliyek nikare bifiroşe ku debara xwe pê bike aliyekî din jî qeweta wan têr nake ku ji bo cejna qurbanê heywan bikirin."

# 'Kiryar DAIŞ e'

Tirkiyeyê di bin navê "Tevgera Şaxê Zeytûnê" di 20'ê çileya 2018'an de êrîşî Efrînê kir. Di adarê de bajêr ket destê Tirkiyê ve. Tirkiyê Goristana Avestayê xera kir û cenazeyên aydê endamên YPG, YPJ'ê û sivîlan jê derxist

Navenda Nûçeyan

Ji Tirkiyê di bin navê "Tevgera Şaxê Zeytûnê" di 20'ê çileya 2018'an de êrîş bir ser Efrînê û di meha adarê de bajêr ket destê komên çekdar ên bi ser Tirkiyê ve. Tirkiyeyê Goristana Avestayê xera kir û cenazeyên aydê endamên YPG, YPJ'ê û sivîlan jê derxist. Cenazeyên li goristanê veşartibûn, di êrîşên hewayî yên Tirkiyê de jiyana xwe ji dest dabûn. Ajansa Anadoluyê (AA) îdia kir ku "gora komî". Lê derket holê ku ev Goristana Avestayê ye û şervan û sivîl li vir hatine veşartin.

Komên çete yên girêdayî Tirkiyeyê li Efrînê goreke cenazeyên 35 kesan dît û îdia kirin ku ew kes beriya dagirkirina Efrînê ji aliyê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ve hatine kuştin. Li ser vê yekê endamên Meclisa Malbatên Şehîdan a Herêma Firatê li avahiya meclisê daxuyaniyek da. Meclisên Malbatên Şehîdan ên navçeyên Tirbespiyê, Girkê Legê, Til Temir û bajarê Qamişlo daxuyaniyên cuda dan. Meclisan kiryarên Tirkiyeyê yên li bajarê Efrînê û vekirina goran şermezar kirin.

Meclisa Malbatên Şehîdan a Herêma Firatê diyar kir ku Tirkiye bi serkêşiya AKP`ê û MHP`ê li pêşberî tevahiya cîhanê, hemû biryarên navneteweyî yên têkildarî mafên mirovan û nirxên wê yên madî û manewî bin pê dike û wiha got: "Her cure rêbazên qirêj li dijî daxwazên gelê me ji bo avakirina welatekî ku tê de her kes bi nasname û rûmeta xwe dijî, pêk tîne. Di dîrokê de tu nimûneyeke wiha qirêj nehatiye dîtin. Heman kiryar berî niha li gelek mezargehên Bakurê Kurdistanê û Serêkaniyê jî pêk anîbû û îroj wekî cara sêyemîn van rêbazan li Efrînê dubare dike. Ew bi veguhestina mezargehên şehîdên wekî baregehên leşkerî bi kar tîne. Ev kiryarên wan kiryarên ku DAIŞ`ê di navbera salên 2014-2015`an de pêk anîne, tîne bîra me."

**Ji fermandarê HSD'ê bang**

Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk Mazlûm Ebdî jî li ser wêrankirin û vekirina goran ên Efrînê yên ji aliyê Tirkiyeyê ve tê kirin, bang li saziyên navneteweyî kir weke sûcê şer û dijî mirovahiyê bigire dest û li dijî van sûcên Tirkiyeyê bikeve tevgerê.






# 19'ê Tîrmehê şoreşa gelan e

Navenda Nûçeyan

Çirûskên Şoreşa 19`ê Tîrmehê 2012'yan bi pêşengtiya jinan li bajarê Kobanê pê ketin û bi beşdarbûna hemû pêkhateyên herêmê li tevahiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bûn. Şoreşa Rojava di pêvajoya deh salan de têkoşîn û berxwedan nîşan da û di hemû qadên siyasî, aborî û çandî de jî serkeftinên mezin pêk anîn.

Endamê Meclisa Giştî ya PYD Ednan Kalo diyar kir ku Şoreşa 19`ê Tîrmehê ku li Kobanê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir xewnên her ferdekê/î azad bi cih anîn û got: "Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa gel e. Şoreşa Rojava li ser bingeha cihêwaziya pêkhateyên li herêmê hate avakirin ku maf, çand û dîroka her pêkhateyekê diparêze û her pêkhateyek baweriyên xwe yên olî û çandî pêk tînin û pêkhateyên din qebûl dike. Bi saya berdêlên bi hezaran şehîdên ku li dijî rêxistinên terorîst parastina destkeftiyên şoreşê kirin, em rihê şoreşê dijîn."

Nûnera Kongreya Star a Başûrê Kurdistanê Lîman Şiwêş jî wiha got: "Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi piştgirî û berxwedana jinan gihîşte qonaxa îro ku hemû cîhan weke şoreşa jinan dinase. Di berxwedana li dijî dagirkeriyê û şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê de jin pêşeng bûn. Destkeftiyên bi dest ketin bi saya fikir û ramanên Rêber Apo pêk hatine."

## GANÎ SÎSTEMÊ SESERRE BÊRO BEDILNAYENE

# Muhatabo yewin birêz Ocalan o

■ Nevîn Alkan

*Seke yeno zanayene yew serrî yo ke Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP), Partîya Herêmê Demokratîke (DBP), Tevgerê Cinîyanê Azadan (TJA) û Kongreya Komela Demokratîke (KCD) seba şikitişê tecrîdî û yewbîyayîşî xebatêk dabî destpêkerdene û çarçoweya na xebate de heyetêk amebî awankerdene. No heyet xeylê wexto ke bajar bi bajar, qeza bi qeza û dew bi dew şono zîyaretê esnaf, keye û şarî ro. Derheqê xebata ke hema zî dewam kena de Hemsereka Partîya Herêmê Demokratîke (DBP) Salîha Aydenîze qisey kerde.*

**HDP, DBP, KCD û TJA demêko dergo ke xebatê bajar û qezayan da dest pêkerdene. Xebatê şima kam wext de dest pêkerd û amacê nê xebatan çi yo?**

Yew serrî yanî aşma tebaxe ya 2020î ra nata ma sey DBP, TJA, HDP, KCDyî dest bi na xebate kerdî. Nizdîyê yew serrî yo ke ma na xebate rayra benî. Na xebate de amacê ma yewbîyayîşê şarê kurd û Kurdistanî yo, wedarnayîşê tecrîdê serê birêz Ocalanî û şexsê ê de tecrîdê serê şarê kurdî yo. Reyna grevê vêşanîye û zilm û zordarîyê serê partî, sîyasetmedar û dezgeyanê ma yo. Ma şar reyde seba nê mijaran ameyî têreyde û yenê têreyde. Ma waşt ke şarî reyde bêrî têhet se senî çiyan bikerî, têkoşînê xo senî xişn bikerî û ma raybazanê senîyan bikerî vernîya xo. Ma waşt ke hem sîyasetê xo şarê xo rê vajî û dew, taxe, qeza û bajaran de ameyîşê ma yê têhet de ma waşt ke şarê xo ra pêşnîyazan bigêrî û ê nê babetan senî vînenê bizanê. Vera nê babetan de şar çina fikirîyenê bizanê.

**Ma zî vînenê ke şima xeylê bajar, qeza, dewe û taxan de şarî reyde yene têhet. Şima nê xebatan de se kenî û cayê ke şima zîyaret kenî de raştê eleqeyanê senîyan yenê?**

Ma nê xebaran de dew bi dewe, ko bi ko, bajar bi bajar, tax bi taxe, keye bi keye û qeza bi qeza şarî reyde yene têhet. Yew serrî yo ke ma hem hetê Tirkîya û hem zî hetê Kurdistanî de xeylê bajaran gêrayî. Sey nimune ma bajarê sey Çewlîg, Colemêrg, Şirnex, Wan, Êlih, Mêrdîn, Mersîn, Edene, Hatay, Dêrsim daxîl xeylê bajaran gêrayî. Ma şîyî kam ca, dew, keye, taxe, bajar û qeza raştê eleqeyêko xişn ameyî. Ma bi heyecan û wayîrvejîyayîşêk xişn ameyî pêşwazîkerdiş. Çimkî cayê ke ma şîyî de xebatê ma virazîyayî û şar zî zano. Ma timî xebatê sey zîyaretê esnaf û dezgeyan viraştêne. Ma şîyî cayê ke şarê ma cuya xo îdame keno, ewra. Na rewşe kêfweşîyêk xişn da înan. Ê zî wina vatêne. Coka ra ma bi kêfweşîyêk weş ameyî pêşwazîkerdiş.

**Nê zîyaretan de şar şima ra çina wazeno? Şar seba tecrîdî çina fikirîyeno û vera tecrîdî xebatê şima ê senîne estî? Heto bîn de şima derheqê talankerdişê xoza, şero ke yeno rayraberdiş û têkilîya PDK û Tirkîya de çi fikirîyenê?**

Nê xebatanê ma de esas yewbîyayîşê şarê kurdî yo. Ewro vera şarê kurdî de 3 parçeyan de şer esto. Nê parçeyan de ne xoza vanê, ne cinî vanê, ne leyîr vanê pêro yenê talankerdiş û dagirkerdiş. Vera nê hêrîşan de lazim o ke şarê kurd bibo yew. No yewbîyayîş goreyê partîyêk nê, goreyê aşîretêk nê, goreyê parçeyêk nê, goreyê çar parçeyê Kurdistanî yewbîyayîş lazim o. Şar tewr zêde bala xo anceno na babete ser o. Sewbîna şar qala têkilîya PDK û Tirkîya zî keno û nêrazîbîyayîşanê xo ma rê vajeno. 40 serrî yo ke ma seba ziwanê xo, seba kulturê xo, seba erdê xo, seba statuye xo têkoşîn danê û ma têkoşîndayîşî de xeylê bedêlanê giranan da. Ganî her sîyasetmedar û parçe, goreyê çar parçe û Kurdistanî bifikirîyo û têkoşîn bido. Ê seba Kurdistanî nê seba berjewendîyanê xo dewletan reyde têkilîyan ronenê. Ma înan qebul nêkenê. Şarê ma nê çîyan zaf net ma rê vano. Tecrîdê Girawa Îmrali her ca de yeno meşnayîş. Ewro seba twîtêk daxî bi hezaran merdimi yenê muhakemekerdiş û yenê tepiştiş. Şar nê çîyan ma rê vano. Ma zananê ke heta tecrîd nêro şikitiş, tecrîdê serê ma û polîtîkayê şerî ê vera şarê kurdî zî nêqedêno. Coka ra çareserîya yewine şikitişê tecrîdî yo. Şar vano ke çareserîya yewine azabîyayîşê birêz Ocalanî ya. 2013 û 2015î de Serekê Şarê Kurdî Ocalan demêk da vernîya xo û o wext her kes nefesêko asan girewt, ma pêro nêçîyan dî. Bado ke tecrîdê Îmrali giran bî, pêro zîndanan de tecrîd ame rayraberdiş.

Ewro daristanê Kurdistanî yenê veşênayîş. Nê şewatî zî girêdayeyê polîtîkayê tecrîdî yo. Cinî yena qetilkerdiş, sîyasetmedar yenê tepiştiş. Nê heme çîyî girêdayeyê tecrîdî yê. Şar nê çîyan vîneno û ferqê înan de yo. Senî ke ewro seba şikitişê tecrîdî zîndanan de grevê vêşanîye dîya destpêkerdiş, ganî ma zî seba xişnkerdişê grevî têkoşînê xo berz bikerî. Çîyê ke ma rê ameyêne vatiş wina bî. Şarê kurd seserrî yo û taybet zî 40 serrî yo ke seba azadîya xo, seba ziwanê xo û seba estbîyayîşê xo têkoşîn dano. Ma kam ca de şarî reyde biameyêne têhet, mijarê ma çina bibayêne şar zî derheqê nê mijaran de vatêne ke lazim o têkoşîn bêro xişnkerdiş.




Ma waşt ke şarê xo ra pêşnîyaran bigêrî. Şar têkilîya PDK û Tirkîya ra nêrazîyo. Ganî şarê kurd hem Tirkîya de û hem zî çar parçeyê Kurdistanî de sey şarêko azad bicuyo. No heqêqo meşru yo. Şarê kurd bi bedeldayîş û têkoşînê xo her cayê dinya de yeno zanayene

**Zîyaret û gêrayîşê nê cayan de şima raştê eleqeyê şarî yenê la rexneyê şarî estê ya nê? Rêxistinê komelkî çiqas tewrê xebatan benî?**

Wexto ke ma şarî reyde ameyêne têhet rexneyê înan zî estbî. Senî ke ê ma bi coş û heyecan pêşwazî kerdêne, rexneyan zî kerdêne. Rexneyan de vatêne ke lazimo şima na xebate hîna rewe bidayêne dest pêkerdene. Vatêne ke ganî ma nêkewê pey çîyanê bînan, ganî ma azadbîyayîşê şarê kurdî de bibî yew. Şar yewbîyayîşê xo pê ardo la sîyasetmedarê partîyê kurdan hema yewbîyayîşê xo pê nêardî. Lazimo ke şima bêrî têhet û yewbîyayîşê xo pê bîyarî. Ganî yewbîyayîş seba Kurdistanî biba. Rexneyê seba demokrasîya Tirkîya zî estbî. Demokrasîya Tirkîya de tena şarê kurd nê ganî şarê Tirkîya zî têreyde na xebate xişn bikerê. Şarê kurd zaf bedêlan da. Serê nê bedêlan û têkoşînî de sîyasetê Tirkîya ame yew ca. Seba sîyasetî ganî hîna biryardarî, cesaret û hîna bêtersayîş xebatan de ca bigêrî. Beno ke dewleta îqtîdar vajo ke şarê kurd tersayo, şar keyeyê xo de ronişeno la nê zîyaretan de ma vînenê ke wina nîyo.

**Şar seba çareserkerdişê problemê kurd, problemê cinî, krîz û kaoso ke Tirkîya de yeno cuyayîş se vano?**

Nê xebatan de ma wazenê ke komelêk hîra bêro awankerdiş. Komel çiqas vêşe û hîra bibo, komel çiqas bi ciwan, cinî û camêrdan tewrê xebatanê taxe û dewan bibo û cayê xo têkoşînî de bigêro û vatişanê xo bivajo, vera îqtîdarê AKP-MHPyî de komelnasîyêk hîna zêde do pê bêro. Ma çiqas têkoşînê xo xişn bikerî, îqtîdarê AKP-MHPyî hîkayeya faşîzmî, asîmîlasyon, operasyonê sîyasî, dewaya kumpas, tecrîd û ewro sewbîna çîyî wazîyeno serê ma de bêro viraştiş. Sîstemê dîktatorî wazîyeno weyra de bêro awankerdiş. Nê xebatan de mijarê winasî hîna zêde vejîyenê aver.


**Şar derheqê tecrîdê Îmrali de se vano û înan gore çareserîya problemê şarê kurd do senî bibo?**

Xebatan de şarê ma yew çî zaf net ma rê vano. Ewro yena waştiş ke seba safîkerdişê problemê şarê kurd, problemê cinî, krîz û kaoso ke Tirkîya de yeno cuyayîş de birêz Ocalan seba çareserkerdişê nê pirsgirekan şansêko pîl o. 2013-2015î de nê çîyê ke ma vanê zaf baş xo mojna. Eke birêz Ocalan rê rayîr bêro akerdiş, seba çareserkerdişê nê probleman û krîzan do rolê xo kay bikero. Ganî merdim nê çîyan net bîyaro ziwan. Şarê ma kam ca de yewbînan reyde ame têhet se vat ke muhatabê nê pirsgirêkan tena birêz Ocalan o. Dewlet û tay dorme estê ke wazenê muhatabanê sewbînan bivejnî raşte. La şar zaf net ma rê vat û ma zî xora timî wina vanî ke muhatabo yewine birêz Ocalan û Îmrali yo. Coka ra wazîyeno tecrîdê serê Ocalanî bêro şikitiş û bêro azadkerdiş ke fikr û ramananê xo vajo. Nê çîyî her ca de ma rê yenê vatene.

**Tewr peynî seba şar û seba resayîşê amacanê şima vengdayîşêk şima esto ya nê?**


Ma xebatê xo yê yew serrî de dî ke şarê ma pey azadîya, ziwan û heqanê xo de yo. Ewro nizdîyê 40 mîlyon şarê kurd esto. Eke şarêko hende zêde bibo, ganî heqê ê şarî zî bibo. Ganî şarê kurd hem Tirkîya de û hem zî çar parçeyê Kurdistanî de sey şarêko azad bicuyo. No heqêqo meşru yo û seba heqê xo xeylê bedêlan da. Şarê kurd bi bedeldayîş û têkoşînê xo her cayê dinya de yeno zanayene. Şarê kurd se beno wa bibo fek azadî, ziwan, cografya û statuya xo ra vera nêdano. Şarê kurd seba azadîya xo û demokrasîya Tirkîya têkoşîn dano. Ganî yewbîyayîşê şarê kurdî lez bêro pêardene. Destkewteyê şarê kurd binê tehluke de yo. Seba pawitişê nê destkewteyan, xişnkerdişê destkewteyan û daîmîkerdişî, ganî yewbîyayîş pê bêro. Seba çareserkerdişê pirsgirêka kurd, şarê kurd têkoşîn dano la ganî pêro şarê Tirkîya kişta kurdan de têkoşîn bido. Çimkî eke şarê kurd heqanê xo nêgêro, demokrasîya Tirkîya zî pê nîna. Vengdayîşê mi têreyde xişnkerdişê têkoşînî, vera faşîzmî de xişnkerdişê demokrasî û şoriş xişn kerdiş o. Ganî sîstemê seserre bi destê AKP-MHPyî yeno karardiş. Coka ra ganî hişmendîya yewrengî, yewmilletî, yewziwanî û camêrdî bêro bedilnayîş. Şarê kurd nê çîyan wazeno û seba xişnkerdişê têkoşînî xebatan de ca gêno.

## Salîha Aydenîz kam a?



Hemsereka Partîya Herêmê Demokratîke (DBP) Salîha Aydenîze qezaya Erxenî ya Amedî de serra 1973î de ameya dinya. Aydenîze beşa Pîrike Unîversîteya Anadolî ra mezun bîya û Lîseya Meslekî ya Weşîye wenda. Qezaya Kerboranî ya Mêrdînî de gureyê pîrekîye kerda û dayîka 2 domanan a. Aydenîze 20ê Kanûna 2019î de derbazê Partîya Herêmê Demokratîke (DBP) bîya û nika zî hemsereka partîye ya. Aydenîze sewbîna serranê verênan de hemserekatîya SESÎ zî kerda.

# Kaxiza Semerqendê



Kenan Colemêrgî

Di çanda me de, taybet jî di çanda me ya devkî de, şibandin/şibhetî ciheke girîng zeft dike. Ev hunerek e, ji huneran, hunera peyv û gotinan e. Gelek caran di jiyana rojane de jî şibandinan dikin û caran bê şibadin nikarin wateya hevokên xwe nîşan bidin. Ev ji bo ravekirinê rewşek taybet e. Em vê yekê zêdetir di stran û dengbêjiyên xwe de dibînin. Heke şibandin di stran û dengbêjiyên me de nebin heçku kêmasî lê heye.

Her çawa Şakiro şibandinên xwe yên lawiniya jinan bi pirteqalên Dortyolê, sêvên Artemêtê kiribe, Mihemed Arif Cizrawî jî sing û berên Bêrîvana xwe şibandine çil û çar kaniyên zozanên Kurdistanê. Her wiha em şibandinan di nava gelek stranên Hesen Zîrekî de jî dibînin ku dema meşa xweşdiviya xwe dişibîne meşa "Lence û Lare" an ku meşa Werdekan; ew qas sipehî û bisteh...

Û helbet we niha gelek caran bihîstiye ku kurdan dişibînine kewan, di dûv de jî bendekê lê dirisînin;

"Hemû dijminên serê kewê ne, kew jî dijminê serê xwe ye, jaro kewo !"

Belê, jiyana me Kurdan wiha dibore; em dibînin, diçe xweşiya me (an jî naçe xweşiya me), di bîra xwe de dihewînin, dişibînin û di nava bendan de radiçînin, paşê ev bend bi salan xwe li ser zimanan digewizînin.

Demekê li gundekî Geliyê Zê bûm. Dem ji demên havînê bû, asîman sayî, ceriyan tune. Ji ber stêrkan cih li asîmanan nemabû, ew qas tijî. Pêşiya xaniyekî axeban, civatê xwe dabû ber ronahiya lûkûsê. Min jî pêşiya xwe da ber bi wê derê û tev li vê civatê bûm. Civatek him xweş him germ...

Pîrejinek ji nişka ve axînên xwe kêşan û çend tişt bi devoka xwe ya şêrîn ji civatê re gotin;

"Em hevalekîn
Em av û deravekîn
Me gelêk(pêkre) vedayne kîn (kon)
Dê were biaxivîn
Em heval in hevalekîn"

Paşê berdewam kir;

"Heynê(dema) ez canejin û tifal, dapîra min gelek tiştên xweş digote me. Ji her neviyekê/î xwe re navek lê danandibû. Hingê digote min Kaxiza Semerqendê...

Ez ne wiha bûm, min piştiyên zozanan pişt dikirin ji gundî heta zomê weke qaz û werdekan diçûm, lawiniya min jî ew lawînî bû..."

Qaz û quling û werdek min zanî lê ew nav çibû, hizra min jî pîrê qala kaxizeke li ser tiştekê dike. Weke hûn jî dizanin em Colemêrgî dengê "r"yê nerm dikin û di nava peyvên xwe de berze/wenda dikin.

Belê, Min pirsa xwe ji pîrejinê kir;

Pîrê, bo çi Kaxiza Semerqendê, an ku çi, tê çi wateyê, ev kaxiza li ser çi ye?

Piştî pirsa min Pîrê dest bi qala Kaxiza Semerqendê kir;

"Hûn nizanin, we nedîtiye. Min jî nedîtiye lê belê behs dikin. Dibêjin li ser dinyayê kêm ji wan kaxizan hebûn, kaxizên mîr û hekiman bûn û gelek sîs û law bûn. Ji ber hindê ji delal û xweşkûkan re digotin Kaxiza Semerqendê"

Ji delal, law û xweşkûkan re...

Li ber vê suhbeta çê her kî be û bizane qala tişteke xweş tê kirin helbet dê lê bikole, dê hez bike bide pey zanîna vê tiştê. Min jî wisa kir. Min bala xwe da dîrokê û min hizrên xwe birin li ser gotinên dengbêjiyan, çûm yeko yeko qeydên dengbêjiyan min guhdar kir. Ji ber ku nedibû ku şibandin û teşbîheke wiha dengbêjan bikar neanîbe. Lewre wisa jî bû...

Di dîrokê de wiha qala vê kaxizê (rûpelê) dihate kirin;

Di nava sedsala 8'an de şerek di navbera Çîn/Maçînî û Semerqendiyan de diqewime. Semerqendî gelek leşkerên Maçîniyan êsîr dikin. Di vê navberê de gelek tiştên çandî û hunerî ji van leşkeran dizanin û bo xwe digirin. Yek ji van sûdwergirtinan jî hunera çêkirina kaxizê bûye û piştî vê demê li Semerqendê dest bi çêkirina kaxizan kirine.

Paşê hay jê hatim ku demeke dirêj li devera Colemêrgê jî ev hunera pêkanîne, ev kaxiz çêkirine.

Dema min ji zane û rûsipiyên cihî pirsyar dikir, wan wiha qala çêkirina kaxiza Semerqendê kirin;

"Tîvilên çixlên tûyan zirav dikirin û di nav avê de mend dikirin. Paşê ev tîvil di nava avê de dikelandin, dema weke benikan lêdihatin weke hiriyê dikutan. Hingê weke hevîrê lê dihat, dixistin di nava avê de bi mifsik û sefînokan dipalandin. Digel kaxizên berî hingav çêkirin di bin kevireke giran de rojekê disekinandin, paşê jî li ber sihê radixistin ku baş ziwa bibe. Herî dawî kaxiza zûwabûyî bi şaxên pezkoviyan sîs dikirin. Êdî dibû kaxiza Semerqendê."

Hingê piştî van agahiyan min zanî ku ka çi delalî û lawînî wê pîrejinê hebûye, xweşkûkiyek îza û zor giran...

Û ne tenê ev nav li wê pîrejinê hatibû kirin, dengbêjan jî dema xwestin lawîniyeke bêhempa bînin zimên ev şibandin bikaranîbûn.

Ez dixwazim niha rengê şibandinên vê kaxizê bi gotinên dengbêjan bînim pêşberî we.

Ewilî rengê şibandina Xişo;

Mitirbê Ûsiv Begê Wanê Xişo, diçe geriyanê û dixwaze ji Begê xwe re bo zewacê yekê layîq û jêhatî bibîne. Rêka wî ber bi qesra Yaz Begê dikeve. Dizane ku li wê derê keça Yaz Begê Mencolê heye û delaliya wê têra tu gotinan nake. Hingê da ku bala Mencolê bikêşe dest bi lêxistina ribaba xwe dike. Mencola Yaz Begê, dengê ribabê û Xişo dibihîze û gelek hez dike ew bê li cem wê, dixwaze ew bi taybetî guhdariya Xişo bike û Xişoyî daxwaz dike dîwana xwe û Xişo diçe dîwana Mencola Yaz Begê;

Xişo dest bi strana xwe dike, wiha lawiniya/delaliya Mencola Yaz Begê tîne ziman;

"Sibê du sibe ye
Digel baranê tê tabye ye
Bejna xanimê zirav e
Weke taka rihanê ye
Fîstana wê
weke belgê gulê ye
Taxima sing û berê wê
Weke Kaxiza Semerqendê
Qelem dikaşe ji ser tê û diçe ye
Ew ne layiqa kesî ye
Ew layîqa Ûsiv Begê Mîrê Kela Wanê ye"

"Taxima sing û berê wê, weke kaxiza Semerqendê ye..."

Li devereke din em dengê M. Arifê Cizirî dibihin;

Mihemed Arifê Cizîrî dema strana "Seyrana Mela Mûsa" digot çar pênc caran şibandina "Kaxiza Semerqendê" dikir, hingê dibe ku ew stran min sed caran guhdar kiribe lê belê weke gelek peyvan min digot dibe ku qala cihekê dike qala tiştekî din dike. Ji ber ku em vê yekê dizanin; di nava hunermendên kurdan de (an jî weke gotina M. Arif Cizirî " di nava fenanên kurdan" ) yên ku herî zêde şibandinan dikin yek M. Arif bû yê din jî Hesen Zîrek bû. Em vê yekê jî dizanin ku stranbêjên ku herî zêde stran afirandî ev her du hunermend in. Em niha baştir fêm dikin, wan rêka xwe, rêka stranên xwe baş ronî kirine û sûd ji xwezaya Kurdistanê bi vê rêbazê hilgirtine.

Mihemed Arif Cizîrî wiha digot;


Singê Seyrana Mela Mûsa
Tertir e ji xunava ber sibehê
Rohntir e ji heyva çardehşev
Spîtir û sîstir e ji kaxiza Semerqendê...


Weke mînakên li jor; ew jêhatin, ew hostahiya peyvan, ew raçandina şibandinan, ew aşiqî û xoşewistiya wan a xwezaya Kurdistanê, ew jîritiya lêkanînê û dilpakiya stran afirandin û gotinê... Mixabin niha em gelek ji van dûr in. Gelek ji xwezaya xwe dûr ketin û me reng û taybetiyên xwezaya xwe ji bîr kirin, me êdî guh neda kûrahiya peyvên stran û kilamên xwe. Me êdî xwest digel çend enstrûmanan newayeke xweş biafirînin, li cem jî du sê bendan lê bînin û me wisa kir êdî me xweza û evînîtiya xwe ya dilpak ji bîr kir.

Dixwazim bendeke dawî li vê derê danim, bo xweşkûkiya Sînem Xanê hatiye ristin, digel kaxiza Semerqendê.

Dengbêjek ji Colemêrgê qêr dike û dibêje;

Hey lê Sînemê Îsayiyê
Dê min got tu ya rind î
Tu sorgula baxan î
Kaxiza Semerqend î...






## Xwendinek kurt bo romana Çerxa Xedar

Rizoyê Xerzî

Bi rastî piştî ku min romana Çerxa Xedar ya Yaşar Eroglu xwend wekî belgefîlmekî çîroka koçberiya kurdan ya ji cih û warên wan hat ber çavên min. Her wiha dibe şahidê zilm û zora li gundiyan hatiye kirin û çawa ji neçarî, mal û milkên xwe, cih û warên xwe berdane.

Ji aliyekî din ve jî wekî belgeyeke dîrokî çend grevên birçîbûnê yên girtiyên zindanan jî tê de cih digire. Jiyana di zindanê de, sirgûna girtiyan ya ber bi bajarên dûrî cih û warên wan, zehmetî û pêkutiyên li pêşiya malbatên wan di rêwîtiya wan bajarên dûr de ji bo serdana girtiyan, tev bi rengekî lihevhatî hatiye hûnandin.

Lê li gorî min tiştekî ku kêm maye di vê romanê de ji bo bibe belgeyeke dîrokî an jî belfîlmek ew e ku ne cih û ne jî dîrok nehatiye nivisandin. Gelo ew bûyer li kîjan deverê û kengî qewimîne nehatiye destnîşankirin.

Ez baş nizanim ew yek ji aliyê nivîskar ve bi zanebûn hatiye kirin yan jî xwestiye tiştekî din bibêje. Wekî mînak dibe ku ew yek bi zanebûn jî ji aliyê nivîskar ve hatibe kirin û xwestibe ku bibêje navê gundên ku hatiye şewitandin û xelkê wî hatiye koçber kirin ne girîng e, ji ber ku heman tişt li hezaran gundan qewimîne. An jî bi mebeseteke din bi kar aniye.

Heman tişt ji bo navê karekterên di romanê de jî derbasdar e, mesela ne navên wan lê sifetên wan hatiye bikaranîn. Navên du karekterên sereke Porzer û Porreş e . Heta nîvê romanê navê Fuad wekî Porreş derbas dibe û navê karakterê cerdevan jî heta dawî wekî Porzer berdewam dike.


Bi her halî li gorî min her çendî tiştê li wî gundî qewimiye hema bêje bi heman rengî li hezaran gundên din jî qewimîne û çalakiya rojiya mirinê ya girtiyan jî bi heman rengî gelek caran dubare bûye lê diviyabû navê wê çalakiyê û cihê bûyerê hatibûya destnîşankirin.

Tiştekî din jî bala min kişand di romanê de; hema bêje di hemû destpêkirina paragrafên nû de bi rewşa hewayê dest pê kiriye, her çendî zêde neşibin hev jî wekî dubareyekê di serê xwendevan de çêdike. Wekî mînak 'barana gumreh' gelek caran dubare dibe.

Li gorî min tiştê herî xweş û balkêş jî di vê romanê de karakterê dayika Fuad, Sînemê ye ku di bin çi şert û mercên giran de diçe girtîgehên wan bajarên dûr ji bo serdana kurê xwe. Ew karakter mînakeke balkêş e ji bo kul, derd, êş, zehmetî û azarên ku malbatên girtiyên siyasî dijîn û vê rewşê baş radixe ber çavan.

Roman bi giştî bi zimanekî sade û xweş hatiye hûnandin û hêjayî xwendinê ye û ji bo ku bibe belgeyeke dîrokî cih û dema van bûyeran jê kêm maye. Tenê li gorî pesindayînê cihê ku ev bûyer lê qewimîne, mirov têdigihîje ku gundekî li ser sînorê başûr e. Ji bo mirov dîroka wan çalakiyên greva birçîbûnê û rojiya mirinê jî nas bike ku kengî qewimîne tu delîl di destê mirov de tune ye, tenê mirov ji çapa pirtûkê dizane ku ew di 2020'an de hatiye çapkirin û çalakiya girtiyan ya herî nêzî wê demê rojiya mirinê ya sala 2019'an e.

# Kurdistana Başûr; Di sêgoşeya tirk, Iraq û malbata Barzanî de



Siyamed Sîpan

Piştî têkçûna referandûma serxwebûnê yeka Başûrê Kurdistanê nebû dudo. Gelek lîstikên qirêj li ser Başûr tên meşandin.

Di van hemû lîstikên qirêj ê dijminên kurdan de agahî ango tiliya malbata Barzanî jî heye. Bêguman şaş e ku mirov hemû Başûr têxe bin tawanbariyekê, bes ji ber ku malbata Barzanî Başûr bi rê ve dibin, êdî Başûr ketiye sêgoşeya dewleta tirk, dewleta Iraq û Malbata Barzanî.

Bi niyeta serxwebûna referandûmê dest pê kirin, di dawiyê de hate asteke wîsa ku hemû hêza xwe jî ji dest da kir. Balafirgeh û cihên herî stratejîk dewleta Iraqê desteser kir. Her wiha cihên sînor û girîng jî hemû ketin destê artêşa Iraqê. Ev kêmasiya malbata Barzanî, Başûr bi dehan salan paşde xist. Her wiha piştî wê aloziya der barê vekişandina ji Serokatiya Heremê ku Mesûd Barzanî divê 2013'an ji Serokatiyê vekişiya bes 2 salan zêde li ser desthilatdariyê ma.

Di sala 2014'an de pêşmêrgeyan heremên kurdên êzidî tenê hiştin. Ya rast ew e ku pêşmerge bi fermana malbata Barzanî ji Şengal û heremên derdorê reviyan. Ev ne çûyîn an jî vekişandinek bû, navê vê ya "rev e" - ji ber DAÎŞ ê reviyan.

Her wiha, nexistina Seroka Parlemenê hwd. Her wiha hilbijartinên di bin zext û qedexeyan ên 2017'an. Van bûyeran derbeyên giran li vîna Başûr xist û ji azadiyê dûr xist.

Gelek caran dibe ku we bihîstibe, nûçeyên der heqê ku malbata Barzanî li Baverly Hills vîlayek bi 47 mîlyon dolar kirîne. Aliyê ecêb ew e ku dema Pêşmerge bi mehan bê mehane (meaş) xwe dimîne û tu biçe bi pereyê gelê xwe li Amerîkayê belav bike.

Tê gotin ku pereyên malbata Barzanî derdorê 41 mîlyar dolar e. Ev tê wateya ku malbata Barzanî di nava 10 malbatên cîhanê yê herî dewlemend de ye. Heger wek kes mirov lê binêre Barzanî di nava 20 kesên dewlemend ên cîhanê de ye. Bi gotinek din dikarin bi pereyên xwe Kurdistana Başûr ji Ewropa pêşdetir bixin û moderntir bike. Lê bes Şam şekir e, pere jê şêrîntir e!

Balkêş e ku dema di havîna 2014'an de DAIŞ'ê êrîşî bajarên Kerkûk û Mûsilê dike, gelek malbatên başûrê Kurdistanê ku nêzî Malbata Barzanî ye û gelek dewlemend in Başûr terk dikin û diçin Kuveyt, Libnan û Urdinê.

Mesûd Barzanî bi xwe di wê demê de ji PKK'ê alîkariyê dixwaze û ji ber ku serkeftî ne spasdariyên xwe ji wan re bi lêv dike. Dîmenên wî yên li wargeha Mexmûrê bi gerîla re, di bîra her kesî de ye.

Ji xwestina alîkariyê û spasdariyê em hatine xala şerê bi gerîlayan re. Gelo çi qewimî ku malbata Barzanî dev ji Kurdistanê berda û tenê li bêrîkên xwe difikire?

***Ez tenê dixwazim hinek pirsan bikim:***

✓ Çima hemû sazî û organên dewletê di destê malbata Barzanî de nin? Biraziyê Mesûd Barzanî - Nêçîrvan Barzanî Serokê Herema Kurdistanê ye. Lawê Mesûd Barzanî - Mesrûr Barzanî Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye. Lawê Celal Talabanî jî Cigirê Serokê Herema Kurdistanê ye. Her wiha lawek Mesûd Barzanî yê din jî wek Fermandar li ser hêzên Peşmergeyan e. Lawek din jî berpirsyarê zanîngeh û cihên zanistî ye?

✓ Bo çi hemû TV û çapemenî di destê malbata Barzanî de nin?

✓ Çima li herêma Kurdistanê bi dehan baregehên leşkerî û li gorî çavkaniyên herêmê nêzî 30.000 leşkerên dewleta tirk hene?

✓ Çima îstixbarata tirk MÎT bi hêsanî dikare bigere û kuştina kurdan organîze bike û pêk bîne?

✓ Çima TV yên dewleta tirk dikare navendên xwe li başûrê Kurdistanê veke û Ronahî TV nikare?

✓ Çima deriyê Sêmalka ji aliyên PDK'ê ve tê girtin û kesên ku bixwaze derbasî Rojava bibin bi pirsên ku xebatkarên MÎT'ê amade kirine re rû bi rû dimînin?

Ev tê wê wateyê ku ne Başûrê kurdan e - ev Başûr yê Malbata Barzanî û dewleta tirkan e.

Bûyerek heye ku gelek pê bi hêrs bûm. Dibêje dema şahiya serokatiyê de ku ji Mesûd Barzanî derbasî Nêçîrvan Barzanî bû, ji ber ku Wezîrê Karê Derve ê tirk amade bû, "Ey Raqîb" nehate xwendin. Mirov dikeve, lê ewqas nakeve. Mirov xwe bi çûk dixe, lê ewqas bêrûmet nake.

Girtina deriyê Sêmalka tê wateya birçîhiştina Rojava û Başûr jî. Divê rojek berî rojekî KDP ji vê şaşiyê vegere. Jixwe ji her aliyî ve êrîş li ser Rojava hene. Malbata Barzanî jî dixwaze xencerekê li pişta Rojava bixe.

***Vekişandina gerîla ji herêmê nabe mijara nîqaşê jî:*** ji ber ku gerîlayên PKK'ê di salên 1981-1982'an de li wan çiyayan bi cih dibe. Yanî ev nêzî 40 sal in. Her wext di çapemeniya malbata Barzanî de wisa tê xuyakirin, ku ev 5-10 sal in gerîlayên PKK'ê li heremê bi cih bûne. Bes rastî tiştek dinê ye.

Tu biçe ji zarokek 7 salî jî bipirse, ew ê ji te re bibêje ku niyeta dewleta tirk dagirkeriya başûrê Kurdistanê ye. Hemû cîhan jî vêya dizane û dibêje, tenê malbata Barzanî ji vê xeteriyê re çavê xwe digire. Hemû cîhan zane ku dewleta tirk heya niha ketiye ku derê jê derneketiye. Ji Başûr jî bi xweşî dernakeve. Tenê bi berxwedanê dikare derkeve.

Heger malbata Barzanî zextan li ser gel neke ew ê gelê başûrê Kurdistanê tu car dagirkeriyê qebûl neke. Çawa ku li Bamernê û gelek cihên din, gelê Başûr rabû ser piyan, ew ê nehêle ku dewleta tirk têkeve xwîna kurdan.

Gelê Başûr ew ê xwedî li vîn, rûmet û axa xwe derkeve.

Xala dawî ya ku gelek girîng jî ew e ku heger gerîlayên PKK nebûya, ew ê heya niha dewleta tirk Başûr ji mêj ve dagir bikira. Ew ê bi awayekî fermî dagir bikira û li her deverê alaya xwe biçikanda. Gelek caran (wek Oremar, Zap, Metina, hwd.) gerîlayên PKK'ê nehiştiye dewleta tirk bi hêz û çekên giran derbasî Başûr bibin û dagir bikin.

Ez bibêjim çi, hêvîdar im Başûr rojekê bibe Başûrê hemû kurdan - we demê ez ê jî bi serbilindî biçim Başûr û navê wê li her derê cîhanê belav bikim...

***Çavkanî:***
***Firatnews, Geopolitik, Giga-Hamburg, Kurdistan Report, Weser Kurier, eKurd.net, Heise.de, Der Standard, Jungle World, Nikolaus Brauns***

Cejna we pîroz be!

MEBYA - DER 2019

Bi hêviya aştiyeke birûmet, aramî, xweşî û azadiyê em ji dil û can Cejna Qurbanê di serî de li malbatên xwe yên fedakar, li hemû gelê xwe û li cîhana îslamê pîroz dikin.

**Komeleya Yekitî û Çandê ya Piştevanî û Alîkariya bi Malbatên Xizmên Xwe li Dergûşa Şaristaniyan Wenda Kirine**

# YNK û PDK berjewendiyên gel nafikirin

Serdem Silo

Partiyên desthilatdar ên başûrê Kurdistanê û bi taybet Yekitiya Niştimanî ya Kurdistan (YNK) û Partiya Demokrat a Kurdistan (PDK) gel weke kole dibînin ku bi hezaran ji bo azadiya Kurdistan şehîd dane, gel nafikirin û tiştekî pêşkêş nakin. Gel jî weke gotina pêşiyan “berf heliya û mêrg xuya bû” êdî rastiya YNK'ê û PDK'ê nas dike û van her du partiyan gelek caran gel li paş xwe hiştin. Bi taybet piştî komkujiya Helebçe û Enfalê di salên 80'yî û 90'î yên sedsala borî de û herî dawî jî li Şengalê piştî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê di tebaxa 2014'an de.

Piştî raperîna sala 1991'ê ku gel li dijî rêjîma Baas'ê rabû, YNK û PDK'ê destkeftiyên gelê kurd desteser kirin. Tevî ku nêzî 25 sal di ser rêveberiya Başûr re derbas bûye, hîn rewşa xizmetguzarî û jiyanî ya gel di asteke lewaz de ye. Ji ber xemsariya van partiyan û sozên wan ên derewîn, hîn bi sedan gund bê av û kehrebe ne û heta toreya telefonan jî negihîştiye wan.

Dema ku mirov salên raperînê bi bîr tîne dibêje ku her tişt asayî ye, lê dema ku tu ji welatiyekî herêmê rewşa jiyanê dipirsî, bersiva wî û bi taybet di vê demê de dê wiha be: “Hikûmet mûçeyan nade, kehrebeyê peyda nake, buhaya xurek û kirêya xaniyan gelekî bilind e”.

Lê dema tu ji cotkarekî pirs bikî dê bêje: “Salan e em ziyanê dibînin, hikûmet hemû kelûpelan û heta hêlkeyan ji Tirkiye û Îranê werdigire.”

Weke tê zanîn herêma Kurdistanê bi petrol û madeyên xwezayî dewlemed e, lê welatiyên herêmê û bi taybet gundên çiyayî aloziya peydakirina sotemeniyê dijîn û pêdiviyên petrolî bi awayekî sîstematîk li welatiyan nayê belavkirin. Lîtreya benzînê gihîşte 950 dînarên Îraqî, her wiha aloziya darayî li hemberî herêmê ev çend sal in ji ber gendeliya nava saziyên hikûmetê rû bi rû ye, her wiha diziya tê kirin ku êdî deynên li ser hikûmetê kombûne gihîşte 28 milyar dolarên amerîkî.

Di warê nirxên niştimanî de li Başûr, ne pêkan e behsa nirxên niştimanî were kirin, ji ber ku partî bi berjewendiya niştimanî nafikirin û tenê bi komkirina pereyan û diziya ji xezîneya giştî ku milkê gel e difikirin. Êdî her rayedarek bûye xwedî jêdera aborî ku di bingehê de jêdera gel e. Weke mînak bîrên petrolê girêdayî partiyekê ne û gaz jî yê partiyeke din e, her wiha dahata dergehên sînor jî girêdayî rayedarekî partiyeke din in. Ev pere tev dikevin berîka rayedarên herêmê, hikûmet jî niha mûçeya karmendan %21 dibire û mûçeya 3 yan 4 mehan jî nedane.

Tevî gelek bang û daxwazan û bi taybet ji aliyê Kongreya Niştimanî ya Kurdistanê ve ji bo lidarxistina kongra neteweyî ji bo sazkirina nêrîneke hevbeş da ku li hemberî xeteriyên li ser Kurdistanê derbikevin. Dîsa jî YNK'ê û PDK'ê bersiva van bangan nadin.

Di van demên dawî de KNK'ê gelek civîn bi blokên kurdistanî yên herêma Kurdsitanê re li dar xistin. Lê PDK'ê hê jî bersiva KNK'ê ji bo lidarixistina civînê nedaye, diyar e PDK'ê xwe weke partiyeke Kurdistanê nabîne û berjewendiyên xwe yên partiyane ji xwe re armanc û bingeh dibîne. Weke gotina pêşiyan “bila dukanek be bila ya min be”.

PDK'ê destdirêjiyên dewleta tirk ku ji 23'yê nîsana borî ve li Zap, Avaşîn û Metîna dest pê kiriye nabîne û li şûna ku Tirkiyeyê tawanbar bike, PKK'ê tawanbar dike. Heta niha jî ti daxuyaniyek li dijî Tirkiyeyê parve nekiriye û berovajî wê di aliyê istixbaratî, leşkerî û aborî de hevkariya wê dike. Êdî şirketên Tirkiyeyê yên li Başûr zêdetirî 2500'î ye.

Dema ku em karê van her du partiyan dibînin eşkere dibe parastina nirxên niştimanî bo wan ne xem e û guh nadin destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan pêk hatiye.

# ‘Bi girtina nûneran dixwazin tirsê ava bikin’

**Endamê Nûnertiya Rêveberiya Xweser ê li Başûr Cemîl Rehmano, têkildarî endamên PYD'ê yên ji aliyê PDK'ê ve hatibûn binçavkirin axivî û diyar kir ku girtina nûnerên me û bersivên PDK'ê gumanên micîd dide avakirin**

Navenda Nûçeyan

Di 10'ê hezîranê de hêzên PDK'ê nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD'ê Mustefa Xelîl û Mustefa Ezîz ku ji bo pêşwazîkirina mêvanên xwe çûbûn balafirgeha Hewlêrê, revandin. Ji wê demê heta niha hêzên ewlehiyê yên girêdayî PDK'ê tevî xwestekên Rêveberiya Xweser û PYD'ê, cihê endamên PYD'ê û sedema revandina wan aşkere nekiriye.

Nûnerê Rêveberiya Xweser Cemîl Rehmano têkildarî revandina nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD'ê Mustefa Xelîl û Mustefa Ezîz, ji rojnameya me re axivî.

**Çarenûsa wan ne diyar e**

Cemîl Rehmano ewilî qala girtina nûnerê Rêveberiya Xweser Cîhad Hesen û endamên pêwendiyên PYD'ê Mustefa Xelîl û Mustefa Ezîz kir û wiha got: “Ew her sê nûnerên me ku hatine girtin yek jê nûnerê Rêveberiya Xweser ê li Hewlêrê ye. Dudu jê jî endamên pêwendiyên PYD'ê ne. Cîhad Hesen nûnerê Rêveberiya Xweser e, Mûstafa Ezîz û Mûstafa Xelîl jî pêwendiyên PYD'ê ne. Li Hewlêrê dimînin. Hinek mêvanên ji komên aştiyê û demokrasiyê ji Ewropayê hatibûn. Nûnerên me xwestin ku biçin mêvanên xwe pêşwazî bikin. Li ser pêşwaziya mêvanan li balafirgehê ew binçav kiribûn û biribûn cihekî nediyar. Ev nêzî 35 rojan e çarenûsa wan ne diyar e. Tu agahiyên wisa fermî ji me re nehatiye dayîn. Ka li ku derê ne, çi dikin, lêpirsîna wan li ser çi esasî ye, ji bo çi girtine. Bes daxuyaniyek dabûn û gotibûn ew kesên ku me wan girtiye komek xwecihî ye. Xwestine alikariya grubeke biyanî bikin. Yanî li ser vî esasî hatine girtin. Weke ku me got heta niha çarenûsa wan ne diyar e.”

**‘Bersivên PDK'ê bi guman in’**

Cemîl Rehmano da zanîn ku wan der barê girtina nûneran de bi PDK'ê re danûstandinan kirine û wiha got:



“Têkildarê girtina nûneran fermî jî û ne fermî jî me hinek danûstandin bi PDK'ê re kirin. Dibêjine ku em wan weke nûner nas nakin û qebûl nakin. Li gel me girtî ne, wê asayîş li ser wan lêkolînan bike û li gor wê bên berdan neyên berdan diyar bibe. Lê heta niha jî negotine li ku derê ne, kîjan cihî ne û li kîjan girtîgehê ne. Malbatên nûneran çûne wê derê. Ji malbatê re jî gotine hûn dikarin mesrefekî pere ji wan re deynin yanî hinek pere ji bo wan deynin û gotine hûn nikarin wan bibînin. Li ser vî esasî hinek gumanên me çêbûn. Ji ber ku ji aliyê PDK'ê ve bersivên wisa neyînî tên dayîn.”

**Nêzikatiyên PDK'ê pir xetere ne**

Cemîl Rehmano bal kişand ser armanca girtina nûneran û wiha axivî: “Girtina nûneran dikeve wê çarçoveya hemleya dewleta tirk a dawiyê ya li ser Herêma Parastina Medyayê. Nêzikbûna PDK'ê bi taybetî jî li dijî Rojava rewşek pir xetere ye. Niha rewşa li Herêma Federal a Kurdistanê jî di xeterêyek mezin de ye. Ev nêzikatî û girtina nûneran derveyî qanûnê tê kirin. Bi vê yekê dixwazin her kesî çavtirsandî bikin. Weke ku tê zanin girseyeke mezin a Rojava li wir heye. Bi girtina nûnerên wan wisa dixwazin tirseke giştî çêbikin. Çawa li bakurê Kurdistanê Tirkiye vê yekê dike diwxazin heman tiştî li başûrê Kurdistanê jî bi taybetî li herêma Behdînan, Hewlêr û Dihokê çêbikin. Girtina nûnerên Reveberiya Xweser û PYD'ê jî dikeve vê çarçoveyê.”

**Danûstandinan asteng dikin**

Cemîl Rehmano herî dawî bal kişand ser hewldanên ji bo astengkirina xebat û danûstandinên kurdî-kurdî û wiha dawî li axaftina xwe anî: “PDK'ê li herêma Behdînanê gelek çalakvan girtine û hikmên giran dane wan. Her wiha ev bûyerên dawî yên ku li herêma Behdînanê tên kirin û revandina nûnertiyên Rêveberiya Xweser û du endamên pêwendiyên PYD'ê di vir de gumanan çêdike ku rolên tarî yanî hinek dest di van bûyeran de hene. Dixwazin rewşa li herêmê aloztir bikin û darbeyek mezin li danûstandinên kurdî-kurdî bi taybetî jî ev xebat û danûstandinên ku li Rojava dest pê kiribû bixin. Li ser vî esasî em bawer dikin ku hinek destên tarî di vê meselê de hene, dixwazin aloziyê kûrtir bikin û şêwaza girtina nûnerên me û yên pêwendiyên PYD'ê li ser vî esasî tê kirin.





Destar

Ehmed Pelda

# Em çima ne pîşesaz in?

Em civateke rêncber in. Pîşesazî layîqî me ye. Û em dikarin vî gewherî zeft bikin.

Wekî tê zanîn warê kurdan rengîn e. Çiyayên bilind, gelî û newalên kûr, deştên bêsînor, avzêyên çem û rûbaran kar û barekî hêja û girîng daye ser milê me kurdan. Ji bo her cûre sewalvaniyê cih û warên zengîn hene. Her wiha ji bo çandiniya dexl û dan, bax û bostan û dar û beran jî derfetên bêhempa hene.

Kal û bavên me jîr û jêhatî bûn. Bi destekî di navbera deşt û zozan de koç kirine û xwedîkirina sewalan re şev û roja xwe derbas kirine. Bi destekê jî di nav zevî, bax û bostanan de keda dest û milan dane, xwêdana eniya xwe rijandine.

Jiyaneke du bineyî her gav bûye warê bicihbûnê. Geh konên zozanan, geh jî xaniyên gund li gor demsalan malovanî kiriye. Amûr û alavên her malê li gor xebatên zemîn û zeman ji hev cuda ne. Ji bo gund, zeviyan, bax û bostanan alav û amûrên cihêreng, cur bi cur ji hesinan, ji daran, ji bafunan, ji sîman û hwd. hatine çêkirin ku wek hewcedariyên çandiniyê, cotkariyê xizmet dikin. Li hêla din jî ji bo pez dotinê, çêkirina mast, rûn, toraq, penêr û dîsa karê pezbirînê hilgirtina hiriyê, şûştin, zuhakirin, şehkirin wê di ber re çêkirina kulavan, nivînan, rêstandin û darxistina tevnan, çêkirina xalîçe, carcim, kilîm û hwd. Bi jin û zarok, keç û xort, kal û pîr ango her kes li gor xwe beşdarî kar û xebatan dibin, wek beşek hilberînê mijûlahiya xwe pêşkêş dikin.

Civata me çawa li gor rengînî û cudahiya zemîn û erdê Kurdistanê karê xwe beş dike, li gor demsalan jî par ve dike.

Çawa biharê dest bi karê nû tê kirin, ango ji tov reşandinê, ji çandina fîdanan, ji derxistin û çêrandina karik û berxikan jiyaneke nû dest pê dike, mal, xanî, kon jî tên sererastkirin.


Havînê tov û berhemên reşandî êdî gihîştine, simbilên genim seridîne û bûne ber ku tê çandin, zevî tên çinîn, mal tê komkirin, berhem tê têkûz kirin.

Payîzê mal û berhemên çêkirî tên barkirin, hilberîn tê parvekirin, nivgeh, tewle, gom tên sazkirin, kadîn tên tijekirin, gîha tê lodkirin, rez tê civandin...

Zivistanê pez û dewar tê xweyîkirin, civat kom dibin, hal û naxil, sohbet û gotin, galegal û kêfxweşî, çîrok û cefen, dawet û govend çêdibin. Bi stran, gotin, serpêhatî û dersdayînê her kes xwe bi awayekî perwerde dike.

Niha em vegerin û jiyana kalûbavên xwe ji nû ve raçav bikin. Hem zeman û hem zemîn xebatê me dide kirin ku hem jî kar û barê kompleks, tevlihev û cihêreng e. Ev rewş me ji şert û mercên gelên dereke an jî hawirdor cudatir dike. Merivên me ji yên çolê cudatir in. Û her wiha ji yên koçber, ên tenê li deştan, ên tenê li bajaran, ên tenê bazirganiyê dikin jî, cudatir in. Gelê me çerxê û niçik û nikulên çerxê dizane, tevnê û darxistina xalîçeyan, sazkirina dem û dezgehan hîn bûye, dartraşî û hesinkariyê dike. Komkirin û bicihkirina bar û berheman hîn bûye. Ga û hespan ji bo bar û siwarbûnê bi kar tîne. Cot, gîsin û dezgehên dartraşî û hesinkariyê ava kiriye. Ev hemû hêmanên sazkirina kargeh û karxanayên pîşesaziyê ne. Civata me civateke xebatkar e. Û her beş jî li gor şert û mercên xwe beşdarî xebatan dibe. Zarok, jin, mêr, xort, keç, kal û pîr her yek li gorî şert û mercên xwe beşdarî kar dibin. Yek jî li derveyî şixul nîne. Bi vî awayî jî teşeyê pîşesaziyê bi çanda xwe ya hewce ye, li ber çavê me amade ye.

Lê mixabin em vê gavê ji vê rastiyê dûr in. Beramberî ku em niha li bajaran jî zêde ne û ji bo me derfetên xwe pêşkêş kirine jî hewla me ya destpêkirina pîşesaziyê nîn e. Her çiqasî sermayedarên me yên xwedî fabrîke hene jî ne bes e. Ji ber ku zengîniya wan takekesî ye. Ya pêwîst cîvakîbûyîna gel, aborî, sermaye û karûxebatê ye. Her wiha xeta ji çandiniyê, cotkariyê û sewalvaniyê ya li deşt, zozan û çiyayan xwe negihandiye bajar ku bi riya kurd û kurdewariyê be. Me zanîn, ezmun û tecrûbeyên xwe yên welatê xwe, mîrateya kalûbavan di jiyana modern de bikar neanî. An jî me çanda gelê xwe sêwî hîşt û xwe radestî çandeke din, civateke din û jiyaneke din kir.



KitêbXaneya CAB

Yaqob Tilermenî

# Ji kûçikan û îtalyanan re qedexe ye!

Nijadperestî, baweriyek e ku hin komên mirovan li gora xuyangên xwe yên dîtbarî û nijada xwe, li gora mirovên dîtir xwe mezin, ciyawaz û taybet dihesibînin. Ji ber vê ciyawaziyê jî, pêşdarazî, cihêkarî û dijminantiyek li hemberî yên dîtir nîşan didin.

Di zanyariya civakî ya hemdem de gotinên weke nijad û etnîsîte weke du têgehên ji hev cuda têne pênasekirin. Peyva etnîsîte bi gelemperî têkîldarî peyva nijadê tê binavkirin û li gora xusûsiyetên jidaybûnê yên weke esl û fesl û tevgerên hevpar tê dabeşkirin. Peymana Yekitiya Dewletan (UN) van her du peyvan weke hev dipejirîne û taybetiya nijadî bi awayekî zanistî ji bo şermezarkirinê rewa dibîne. Û pê re jî tê aşkerakirin ku ev ciyawazî ne bi nivîskî û ne bi tevgerî bi ti awayî nikare rewa were nîşandan.




A rast, têgeha nijad û nijadperestiyê di serdema emperyalîzma Ewropa û têkîldarî mezinbûna kapîtalîzmê de jî di bazirganiya koledarkirina Atlantîkê de weke têgeheke modernî derketiye holê. Lê bi taybetî di sedsala 19'an û serê sedsala 20'î de li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û di serdema Apartheidê de li Başûrê Efrîkayê sedema cihêkariya li dijî mirovan bi xwe bû. Nijadperestî di Holokosta Cihûyan, Qirkirina Ermeniyan, Qirkirina li Balkanan û li Sovyeta kevin bi berbelavkirina kêmaran û gelek aliyên cîhanê ji bo birêvebirina pergalan weke proje hatiye kirin. Bi taybetî jî her tim gelên niştecih ên qedîm tûşî nijadperestiya yên din hatine. Lê ji ber helwesta pozîtîvîst a zanyariyê neteweya kurd naxin nava wê kategoriyê û nayê dîtin û hesibandin ku weke neteweyeke ji sedsalekê zêdetir bi helwestên tunekirin û qirkirinê tê xwestin ji holê were rakirin.

Ger em dev ji têgehên pirtûkan û teoriyên zanîn û zanistan berdin û li gora pratîka dewletên roja me nirxandinekê bikin, em ê bi hêsanî sedem û tevgerên mirovên nijadperest karibin binirxînin û aşkera bikin. Ji ber ku hemû xwendevanên vê nivîsê yê bi eslê xwe kurd, biçûk an mezin, di kêliyek an gelek kêliyên jiyana xwe de tûşî tevgerên tund ên nijadperestiyê hatine û hê jî tên. Hewcedarî pê heye ku xwende û pisporên qada akademî û zanistên civakî yê kurd vê mijarê kategorîze bikin û bi awayekî zanistî li her derên cîhanê pêşkêşî warên xwendewariyê bikin. Siyaseta ku li ser navê çewisandin û eciqandina kurdan tê kirin jî divê van xebatên zanistî ji xwe re weke cihêtname qebûl bikin û daw û doza xwe ya mafdar pêşkêşî mirovatiyê bikin.

Îcar; nijadperestî ne ew tevger e ku mirov navê nexweşiyê lê bike û kesên xwedî helwesta nijadperestî jî nexweş rê bidin. Ev rê û rêbazeke pergala nijadperestiyê ye ku hemû zagon, dad û hiqûqa xwe li gora vê sazûman dikin û li hemberî yên dîtir bi kar tînin. Bûyera dawî ya li HDP'ya Îzmîrê qewimî, ne bûyereke hêsan û şexsî ye ku nijadperestekî tirk xwestiye jineke kurd gulebaran bike û dilê xwe pê hênik bike. Ji roja bûyerê û heta niha, helwesta rêvebirên pergalê, alîgirên wan, tiroleyên (troll) wan ên li ser tora civakî bi gotin û nivîs û helwestên xwe didin aşkerakirin ku ev kirineke bi plan û bername ye û haya berpirsên pergalê jî jê heye. Pê re têkildar jî bêdengmayîna dewletên Ewropa û dewletên ku xwe weke berdevkê wekhevî û biratiyê dihesibînin jî xaleke girîng raberî me dike ku her welatên ku bi hemr û boderayê xwe xemilandine û xwe weke welatên herî baş nîşan didin, di eslê xwe de rabirdûya wan bi mînakên nijadperestiyê dagirtî ne. Her çiqas gelekan ji wan bi zagon û sizadanê xwestine rê li ber van helwestên neyînî bigirin jî tovê xwemezindîtinê tu caran ji GEN û hesinê hin mirovan dernakevin û dê ev tov derbasî nevî û nevîçirkên wan jî bibe. Ev carna bi sedema têkiliyên aboriyê tê nirxandin, carna bi dabeşkirina welatan weke welatên cîhana yekemîn, cîhana duyemîn û hwd. tê pênasekirin. Lê ji hebûna mirov û vir ve ev helwest –ne nexweşî- ji teref hinekan li hemberî hinekên din hatiye rêdan û îro li ser navê modernîteyê bi awayekî tundtir tê rêdan.

Li welatekî weke Swîsreyê ku nêzîkî nîviyê gelheya wê ji penaberan pêk tê, di zagonên xwe de rê li ber cihêkariyê girtiye, bi rêveberiyên pirreng û pirdeng dixwaze ji cîhanê re bibe nimûne, em dibînin ku ne demeke pir dûr lê beriya bi pêncî salekê çi rewşên xirab ên mijara nijadperestiyê hatine jiyîn.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn û di nîveka sedsala 20'î de ku koçberên di sînorê Îtalyayê re dihatin vî welatî, tûşî tevgerên seyr û xirab dihatin. Li rawestgeha trênê ya bajarê Brigê yê li ser sînorê Îtalyayê peywirdarên swîsrî ava DDT'yê dipijiqandin ser îtalyanan, venêrîneke tibî ya çorsî li wan dikirin û li hangareke trênê bi awayekî şûtûrût di serma û seqemê de ew didan şûştin. Hin mirovên ku serma digirtin û bi zatureyeke dijwar dimirin, di çapemeniyê de nedibûn nûçeyeke biçûk jî. Li gora destnîşankirina Oscar Tosato yê ku niha li bajarê Lozanê berpirsek e, di salên 1960'î de li kantona Bielê li ser lotikxaneyekê nivîsa, "Ji kûçikan û îtalyanan re qedexe ye" hatibû daleqandin û ev nivîs demeke dirêj daleqandî maye. Pişt re nivîsên bi vî awayî li ser camên kafeyan jî hatine dîtin. Dîsa hin rêveberên partî û hikûmetê ku bi eslên xwe îtalyan in helwestên mirovên rasîst bi vegotina wan rojan rave dikin. Yek ji vana Claudio Micheloni ya senator e û dibêje: "Dema ez sê salî bûm, li kantona Neuchâtelê di malekê de bi qasî du salan di paş deriyên girtî de mam."

Helbet gotinên gelek mirovan hene ku hem êşbar in û hem jî daxbar, lê dema gotin ji devê mirovên xwedî statuyekê derdikevin, hingê çapemenî û pergal mecbûr dimîne ku cih bide gotinên wan. Massimo Lorenzoyê li kantona Cenevreyê dijî, hîna jî bi çûn û hatinên xwe yên nava Cenevre û Îtalyayê nizane wê xwe aydî ku derê bibîne û ji ber van çûn û hatinan di navberê de maye. Lorenzo dibêje: "Ez li dijî hemû celeb niştimanperweriyên pîroz, derzîkirî me. Ez ne welatekî lê dê hezkirina zêde jê re were nîşandan û ne jî aleke ku dê mirov li binê wê ji ser hişê xwe ve here..." Mirov xweziya xwe tîne ku di rastiyê de derziyek nijadperestiyê hebûya û salekê carekê nijadperest bihatana derzîkirin.

Lorenzo û hemnijadên wî yên îtalyanî gelek caran li gotinên weke Rital, Piafs, Pioums, Maguttes, Spagetti ku di kurdî de tê wateya Biyan, Qijaka Zişt, Zilamê Kêrbel, Meqarneya Dirêj rast hatiye ji ber ku li parçeyê zimanfransî yê Swîsreyê ev gotin ketine ferhenga Fransî.

Em dikarin ji fîlmê derhêner Alvaro Bizzari yê bi navê The Sasonal (1971) vê rewşa navneteweyî ya îtalyanan helwesta du komên ewropî ya li hemberî hevdu li ser ekranê temaşe bikin. Îcar helwesta li dijî mirovên Asyayî û Efrîkayî, bê lome be!..

# Jêza dîrokî ya mafên heywanan

Kadîr Can

Bivê nevê ehlaqî an jî zagonî mafên heywanan bi tu awayî nayê hesibandin. Di dîrokê de her çiqas li ser mafên heywanan nêrînên cûr bi cûr derketibin holê jî nîqaş niha hê didomin. Mirovahî li gorî dîn, çand, berjewendî û hwd. têkiliyê xwe bi heywanan re datîne.

Hin fêrkirinên Pytagorasî bi kûrahî bandor li ser nêzikatiya me ya li hemberî heywanan kiriye. Pytagoras wiha bawer dikir ku ruh nemir e, piştî mirinê koçî laşekî din dike. Li vir ruh li derdora xeleka pêwistiyê digere û dem bi dem koçî laşên din dike û bawer dike heta ku mirov biehlaq nebe li wê derê hêsîr dîmîne. Li gorî baweriya Pytagorasî bûyerên ku li paşerojê qewimîne wek çerxek ku bêdawî dizivire dubare bên jiyîn. Ji ber vê yekê jî li gorî wî tu tişt ne nû ye. Ji van a girîngtir, wiha difikire ku divê mirov hemû cûreyên zindiyan wek xizmên xwe bibîne. Ji ber wan baweriyên xwe jiyaneke vejetaryen tercîh dike û kesên goştxwir şermezar dike. Vejetaryeniya Pytagorasî di hin berhemên xwendevanên wî de wek dîeta Pytgorasî derbas dibe. Heta sedsala 19'êmîn jî vejeteryanî û dîeta Pytagorasî di heman wateyê de hatine bikaranîn. Ji bilî van rasterast mafên heywanan parastiye û zirar dayîna heywanan nepejirandiye. Bi awayekî henekî em bibêjin; li gorî Pytagorasî wexta ku yek kerê xwe bikute, dibe ku bibe bikeve rewşa wek ku rehmetiyê bavê xwe bikute.

Ewil Arîstoteles piştre jî kesên stoîk (kesên ku ji dibistana Stoayê ne) helbet bi awayekî xwezayî fikrên xwe yên dûrî Pytagoras anîne ziman. Li gorî Arîstoteles cihan li gorî rêza meqaman hatiye sazkirin. Bi xwezayî di nav heyînên madî de jî mirov di zîncîra pîramîda heyînê de wek cureyek biaqil di asta herî jor de cihê xwe girtiye. Heta sedsala 19'emîn jî gelek feylesof û zanist wek Arîstoteles fikirîne. Arîstoteles dehayek pir mezin e. Lê Arîstoteles jî mirovahiyê jî tim wisa kirine. Nêzî 2000 sal ji bo tiştên zanîstî rast bê hesibandin lê nêrîne ka Arîstoteles heman tiştê gotiye yan negotiye. Encax piştî 2000 salan mirovahî fehm dike ku gelek nêrînên Arîstoteles wek pergala ptolemy û zincîra pîramîda heyîne û hwd. şaş derketiye. Belê di dîroka gerstêrka me de carnan tiştên wiha diqewimin, lê xwezî ne 2000 sal bûna. Nêrînên stoîstan û Arîstoteles di serdema navîn de jî tên parastin. St. Augustine (354–430) yek ji wan e û bi awayekî êrîşkar nêrînên stoîk diparêze. Ji ber vê yekê jî nezikbûyîna li hemberî heywanan bi awayekî neyînî di teologiya xiristiyanî de bi cih bûye. Piştre di hiqûqa romîyan de jî bi heman awayî cih digire. Wek her tiştê mafên heywanan jî di destê zagonên mêrên biçûk de li cîhanê belav dibe. Di sedsala 3 û 4'an de Hermogenianus dibêje ku "tevahiya hiquqê ji bo mêran hatiye sazkirin", di sala 1966'an Fitzgerald lê zêde dike û dibêje "zagon ji bo mêran hatiye çêkirin û destûr nade ku di nav wan û heywanan de hevaltî pêş bikeve." Gelek mînakên bi vî rengî di dirokê de cihê xwe girtine û di nav hiqûqa kole û heywanan de gelek nêzbûyîn derxistine holê. Piştre bi pêşketina? şaristaniyan hêdî hêdî hin şert û mercên heywanan ên zagonî hatine başkirin.

**Tevgera modern a mafên heywanan**

Wisa tê gotin ku reforma tevgera mafên heywanan cara yekemîn e ku ji hêla feylesofan ve hatiye destpêkirin. Peter Singer û Tom Regan diniminîn ku zagonên exlaqî ên heywanan hene. Pirtûka Singerê ya Animal Liberation (1975) ji bo mafên heywanan wek pirtûka bingeh tê hesibandin. Singer di vê pirtûkê de destnîşan dike ku hewce ye mirov qasî mafên xwe girîngiyê bide mafên heywanan. Singer sûdperest e. Li gorî Singerê di çalakiyên mirovahiyê de kêf çiqas zêde, êş çiqas kêm be li gorî vê pîvanê ewqas ehlaqî tevdigere. Li jêrê jî li ser heman xalê hûr dibe:

"Dikarin bifikirin? An jî dikarin bipeyîvin? Li vira divê pirsên esas ne ev bin. Pirsên esas ev e ku heywan diêşin?"

**Bi qasî mirovan...**

Singer êşa heywanan derdixe ber çawan û dibêje êşên heywanan di bin berpisyariya mirovahiyê de ye û vî tiştî jî wek berpirsiyariyeke ehlaqî dinirxîne. Li gorî Reganî jî bi qasî mirovan mafên heywanan jî hene û "heywan kirdeyên jiyanê ne."

Tevgerên mafên heywanan bingeha xwe ya modern piranî ji van feylesofan digirin. Her çiqas di serî de gelek dîndar, zanist, feylesof li hemberî nêrînên wiha derketibin jî di sedsala 21'emîn de gelek zanist, akademîsyen, feylesof tev li xebatên mafên parastina heywanan bûne. Ji hêla hiqûqê ve jî mafên heywanan zêdetir cih digirin. Dozên bi navûdeng vedibin wek ku heywanan doz li mirovan vekirine. Li DYA'yê û 4 aliyên dinyayê saziyên wek The Animal Welfare Institute (AWI) hatine vekirin ku tenê jî bo binpêkirina mafên heywanan dixebitin.

**Animal Liberation Front**

Li gorî hin raporên FBI'ê Animal Liberation Front (ALF) di sala 1970'an de li Britanyayê hatiye damezirandin. Li hemberî kedşêlandin û îstîsmarkirina heywanan çalak in. Bi awayekî sist rêxistin dibin û zêde tûj in. Mirov encax bi çalakiyên xwe dikarin tev li vê rêxistinê bibin. Di hedefa ALF'ê de şîrketên mezin, petshop, fabrîka û hwd. hene. Di nav çalakiyan wan de ji revandina heywanan bigirin heta sabotajê çalakiyên cûr bi cûr hene. Di salên dawî de bi taybetî jî li DYA'yê rêxistina herî aktîf ALF ye.

ALF mînaka herî baş a berxwedanên bêserok e. Endamên wî rasterast çalakbûyînê diparêzin. Heywanan ji laboratuvaran bigirin heta çewligên kurka rizgar dikin. ALF nêzî 35 welatan bi awayekî çalak aktîf in.

Hin armancên ALF'ê

**Çalakiya zirardayina aborî:** Li hemberî îstîsmarkirina heywanan

**Çalakiya revandinê:** Ji bo rizgarkirina heywanan

**Çalakiya teşhîrkirinê:** Teşhîrkirina zilma li ser heywanan tê kirin

**Çalakiyên sabotajê:** Zirardayina cihên ku zirarê didin heywanan

# 19ê temmuze pawitişê erjanê merdimayîye yo

Helîn Uzel

19ê temmuza 2012î de Kobanê rojêka tarîxî rê şahîdî kerd û serkêşîya destronayîşê awanîyanê hukmatê Sûrîye bî.

Verva sîstemê kapîtalîst ke Rojhelatê Mîyanênî de xetimîyabî, kurd û kurdistanijî, Rojavayê Kurdistanî û Vakurê Sûrîye de alternatîf awan kerdî. Şar bi Projeya Netewa Demokratîke ya ke bi serkêşîya azadîya cenîyan werişt û xeta xo ya 3. afirna. Vernî de hêzê rejîmê Sûrîye yê antî-demokratîke mîyanê xo ra vetî. Çarçeveya Konfederalîzma Demokratîke de xo perwerde kerdî. 19ê temmuza 2012î de Yewîneya Pawitişê Şarî bi awayêko fermî ame resnayene û xo seranserê Rojavayî de bica kerdî. Bajaranê ke rayverîya înan bi dest kerdî de xebatanê seba awankerdişê sîstemê 'Xoserîya Demokratîke' bi lez ameye rayirberdene. Bajar û dewan de zî meclîsê şarî ameyî awankerdene. Nêy xebatanê rêxistinî di serran dewam kerd. Şarê Rojava 2014î de zî tekoşînê xo bi serkewtişanê pîlî tacîdar kerd. Rayverîya Xosere ya Kantonê Kobanê, Kantonê Cizîr û Kantonê Efrînî ameyî awankerdene. Sere de şarê Rojava û heme şarê Kurdistanî kêfweş bîyî. Rayverîya Xosere bi pratîkê xo nawit ke seba çareserîya rayirê yewin înan ê. Çarçeveya xebatanê Rayverîya Xosere de yewîtîya civak, rêxistin û sîyasî ya mabenê heme pêk ameyîşanê Rojava de ame awankerdene. Nêmî Rayverîya Xosere cenîyan ra pêk yena. Welatanê bînî ê dinya zî seba çareserkerdişê alozîya Sûrîye, Rayverîya Xosere muxatab girewt. Netîceyê xebatanê dîplomasîye de xeylê temsîlkarê Ewropa û welatê bînî verê xo dayî Rojava û sîsteme kantonan nêzdî ra taqîb kerdî.

Heme kesê ke şîyî Rojava û şoriş de ca girewt, mat mendî. Xoverdayîşê Kobanê dîyî.

Hêrîşo tewir pîl û verhîra bi paştîdayîşê dewleta tirke, verva Kantonê Kobanê pêk amebî. Çeteyanê DAIŞî 15ê Êlula 2014î de bi hawayêko verhîra, seba îşgalkerdişî hêrîşê Kobanê kerd. Verva naye Kobanê de xoverdayîşêko tarîxî ame ramitiş. Hêzê Yewîya Pawitişê Cinîyan (YPJ) û Yewîya Pawitişê Şarî (YPG) 134 rojan verva hêrîşanê dagirkerîye ê DAIŞî de xover da. Seranserê Kurdistan û dinya de zî şar werişt payan ser. Bi saya xoverdayîşe tarîxî û destane ya di serre hêzê YPG û YPJyî 26ê Çeleyê 2015î de Kobanê çeteyanê DAIŞî ra xelisna. Şervanê azadîye badê xelisnayîşê Kobanê verê xo dayî heremanê bînan ke DAIŞ tede bî. Xeylê bajar û qezayan çeteyanê DAIŞî ra ameyî pakkerdene. Şorişê Rojava her ke şî pîlêr bî û toximê ci resa Başûrê Kurdistan û Şengalî. Çeteyê DAIŞî 3ê tebaxa 2014î de verê xo dabî Şengal û bi hezaran cenî û domanan qetil kerdî, remnayî û sey rotî. Şorişgerê azadîye seba ke şarê Şengalî bixelisnê hemle dabî destpêkerdene. Bi akerdişê korîdorî, bi se hezaran Êzidîyî qirkerdişî ra xelisîyayî. Rojava de badê pakkerdişê heremêko verhîra, xebatanê xorayîrberdişî zî resa astêka berz. Tena Rojava nê, Bakûrê Sûrîye zî tewrê ci bî. Hêzê Sûrîyeya Demokratîke (HSD) ame awankerdene. HSD Şorişê Rojawayî zafêr nizdîyê serkewtişî berd. Kanûna 2015î de Dêrîk de Meclîsê Sûrîyeya Demokratîke (MSD) ame awankerdene. Mîyanê MSDyî de heme pêkameyîşanê Sûrîye estbî.

5ê Sibata 2016î de zî Konseyê Cenîyan yê Sûrîyeya Azade ame awankerdene. Adara 2016î de Meclîsê Federalîzmê Demokratîke ya Vakurê Sûrîye ame resnayene. Heto bîn ra zî hêzê hegemonîkî verva ena sîstemê demokratîk û xoserî, hêrîşê xo zêdîna û waşt kontrol bikerê. Mînak, herema tewir aram Efrîn bibo. Heta ke dewleta tirke bi hêrîşanê xo ewca îşgal kerd. 20ê Çeleyê 2018î de dewleta tirke bi desan teyareyanê şerî verva Efrînî hêrîş da destpêkerdene. Hêrîş 2 aşme, şewe û roje dewam kerd. Bi seyan sîvîlî ameyî qetilkerdene û dirbetinkerdene. Reyna sûcê şerrî û sûcê verva merdimayîye pêk ameyî û xoza ame talankerdene. Verva nêy heme hêrîşan, şarê Efrînî kişta şervananê xo de ca girewt. Ewro zî seba xelisnayîşê Efrînî, xovederdayîş dewam keno.

Şorişê 19ê temmuze bî bingeya awankerdişê sîstemê xoserîya demokratîke yo. Ena sîstem heme pêkameyîşanê hereme gêna xo mîyan. Şorişî reyde omudê awankerdişê cuwîyeyêka newe vejîya werte.



# Dinya bê merdim zî dinya ya



Av. Cemila Turhalli

Emrê merdimî goreba dinya çîyêk nîyo. Emrê dinya 4,5 mîlyar serrî yo, emrê merdimî 200 hezar serrî yo. Dinya ra zî çîyê pîlî estî. Aye zî galaksî ya. Mîlyaran serran ra dima dinya tebîetêk hususî virazîya. No tebîet de bi mîlyaran cuyî virazîyayê û mîlyaran zî vîndî biyî û bedelîyayê.

Merdim hezaran serran verê cû ra heta nika kewt kaînat dima. No merak rihê merdimî ra dest pêkerdene û heta teber dewam kerdêne. Zereyê merdimî de her tim merak estbî. No merak înan rê gêrayîş û fekveradayîş arde. Gêrayîş û barkerdişê merdim û fikrê merdimî zî bedelîna. Fikrê merdimî senî bedelîya merdimîye dor û verê xo zî bedelna. Verecû şîyêne awe ardene û şimitêne, dima ra vernîya awe girewt û rayê awe bedelna. Verecû daran ser de rakewtêne, dima ra daran birna. Birnayîşê daran ra dima tewr vernî xo rê keye viraşt. Taynan zî semedê germîya xo û taynan zî semedê veşanîya xo veşênayî. Merdim cuya xo serê her ganîye de vînayêne. Heywanan kerdî binê destê xo; muyanê înan ra bigêrêne heta şitê înan û goştê înan ra havilê/feyde girewtî. Merdim senî dor vere xo bedelna tebîet zî bedelna. Vernîya çimeyan girewt, rengê çeman bedelna. Rayîrê xo viraşt, rayîrê cuyanê bînan bedelna. Çimbarîtîya merdimîye qet nêvindert. Waşt hertim sey xo bikero û tena xo waşt. 8 hezar serrî verê cû cuya merdim bi kabîleyan sero bî.



Çend hezar serran ra dima pey kefşê erdî kewt. Erd kena û vêşanîya xo vîyarna. Erd înan rê bereketêk pîl arde. Labelê wextê xo yê zêde zî serê erdî de vîyarna. Vera vera nufusê merdimî zî bî zêde. Texmînî merdim senî kewt cuya cuya cabîyaye înan hezaran ra bî mîlyon. Kontrolê hezaran asan bî, labelê kontrolê mîlyonan asan nêbî. Nêweşîyê pîlî dekewt zerê merdiman, nêweşîye ya înan qir kerd ya zî zafaneyê înan xela ra merdî. Adaptasyonê merdimî zaf baş bî. Cayê xo bedelna fikrê xo bedelna. La reyna zî çimvêşanîya xo ra fek vera nêda.

Merdimîye heqê xo serê tabîatî de vîneno. La nêweşî û xela senî dî, fikrê xo zî bedelna. Zanayêne ke bê tebîat merdimîyê dewam nêkena. Ge-ge bawerîya înan de heywan bîyî muqeddes, ge-ge darî bîyî, ge-ge behr bîyî, ge-ge zî tîje û aşme bîyî. Merdim zanayêne ke ganîtî merdim rê nêamêya. La reyna zî heqê xo serê ganîye de vînayêne.

Cuya cabîyaye verê cû semedê derbazkerdişê vêşanîya xo û dima ra zî dewamkerdişê cinsê xo bî. Vera vera fikrê xo pîl dî û fikrê xo serê tebîetî de dî. Tîje û aşme ra fek vera da û herinda înan de swbîna çîyan homa kerd. Homa ra fek vera da na reye xo kerd herinda ci. Heqê merdimîye verê cû destê xo de nêdîyayêne labelê dima ra heqê xo kerd binê destê merdiman. Pê destê xo serdestîyê xo waşt. Herb vet û dima koletî ard.

Koletî destê muktedîran pîl kerd. Mulkê înan ser şixulnayîşê koleyan zêde bî. Wayîrê erdan tena pîzeyê koleyan kerdêne mird. Werdişê înan qasê ke ê nêmirê dîyayêne înan. Wayîrê înan sey eşya ewnîyayêne înan. Nufusê koleyan zaf bî. Labelê qewetê înan, bawerîya înan, înan rê nêameyêne. Vera vera fikrê koleyan no sîstem qebul nêkerd. Heqê xo înan ra waşt. Nêwaştêne keda înan tena feyde bido efendîyan. Waştêne ke feyde bireso înan zî. Heqê xo bi serewardartişê xo girewtî. Serewedartişê înan vera ameyî qetilkerdiş. Labelê reyna zî heqê xo ra fek vera nêdayî.

Her fikir bi mezelê fikran ano. Her fikir bi serewedartişê sero fikrê xo zêde keno. Cuya cabîyaye her wext fikrê merdiman sero aver şino. Bedelnayîşê fikran ge-ge bi zorî ge-ge zî bi zerrî beno. Medenîyetê hezaran serran verî nika nêmendî, çimki fikrê înan, ziwanê înan kewtî binê deste sewbîna kesan. Kultur hertim pêrdayîşê merdimîye sero bedelîyeno.

Vêşanîya merdimî verê cû ra heta nika timî talanê xoza arde. Vêşanîya merdimî qetilkerdişê merdiman arde. Merdim bîyo suçdarê merdimîyeya xo û bîyo qatîlê xozaya xo. Çend serran de reyêk talankerdişê xoza û tebîetî nêveşîyêk pîl ana.

Merdim, heta heqê xoza nêpawo nêeşkeno heqê xo sero vindero. Yew raştî esta ke aye zî çimê dinyayî pêro merdiman rê helbet qîm keno. Labelê çimê dinya çend hezar patronan rê qîm nêkeno. Patronî heqê xo serê xozaye de vînenê. Goreba înan tebîet milkê înan o. Tebîet sofrayê înan o. Na sofra ra vêşanî qet nêvîyarenê. No vêşanîye talankerdişê xozaye lez ana. Wextêk talankerdişê tebîetî destê merdiman de bî, la na reye helbet tebîet xo bedelnena û bê merdim xo dewam kena. Goreyê tebîet merdim esto çîno xemê aye de nîyo.

# Cejna we pîroz be!

Cejna Qurbanê cejneke taybet e ku yekitiya me ya
manewî û ruhê me yê piştgiriyê xurt dike.
Bi vê boneyê em hêvî dikin ku cejna we di nav xweşî,
aramî û aştiyê de derbas bibe,
em cejna we ya qurbanê pîroz dikin.

ÇINAR BELEDİYESİ 1937

**Serokê Şaredariya Çinarê Bedrî Kaya**

# Cejna we pîroz be!

Cejn rojên aramî, aştî û şadiyê ne. Bi hêviya ku
Cejna Qurbanê ji bo gelê me û tevahiya cîhana
îslamê bibe roja aramî, aştî û şadiyê.
Em cejna gelê kurd û hemû dayikan pîroz dikin.

**Dayikên Aştiyê**

# Enstrumaneke jibîrkirî: Lîr

Bêrîvan Kayi

Hermes êvara ku diwelide, ji dergûşê derdikeve û diçe li ber kûsiyekî rûdine û ji pişta kûsiyekî lîrê çê dike. Her ku tiliyên xwe dide vê qalikê, deng û awazên xweş jê dibarin û li ber vî dengî direqise, dansê dike. Piştî çend salan Hermes rojekî diçe diziya çêlekên xweda Apollon. Dema xweda Apollon bi vê yekê dihese pir hêrs dibe û ji bo ceza lê bê birîn, bi milê Hermes digire û wî dibe gel xwedayê mezin Zeus. Hermes li wir radihêje lîra xwe, lê dixe. Zeus û Apollon bi hev re, ji dengê lîrê sermest dibin. Zeus hingî ku di bin bandora dengê lîra Hermes de dimîne li şûna ceza, cotek pêlavên ku perên wan hene diyariyê Hermes dike. Êdî ji wê rojê ve Hermes dibe wek derwêş û kahînekî ku rê û rêbazê nîşanî kesên ku di rê de mane dide û pêşengtiya ruhên di rê de mane dike.

Çîroka afirandina lîrê çîrokeke qedîm e û tenê ne wek çîroka li Yewnanistanê ji Lûviyan heta Sûmer û Misriyan enstrûmaneke ku li ser vê çanda qedîm afiriye û di rojên seyranê, xweşî û şahiyê de mirovan dilê xwe pê xweş kirine. Çêkirina lîrê îro, hema bêje tune ye û ev enstrûman her çûye navê wê tenê li ser fresko û amphorayan maye. Vêca ka em berê xwe bidin îro...



Alî Eren Gul muzikjenekî ji Dêrsimê ye û enstrûmana kevnare ya bi navê lîrê, yên ku bi sedan salane hatine jibîrkirin, diafirîne. Gul têkildarî çêkirina lîrê de bi rojnamê re axivî

**Nivîskar û mûzîkjen**

Alî Eren Gul (35) ji navçeya Ovacikê ya Dêrsimê ye. Ji temenê xwe yê biçûk ve di nav kar û barên cûr bi cûr de şixûliye. Heman demê nivîskar û mûzikjen e. Gul ji zaroktiya xwe ve li ber enstrûmana pîroz mezin dibe û di temenekî biçûk de hînî tembûrê dibe. Lê her ku diçe dikeve nav lêgerîna hin enstrûmanên din û dawiya dawî lîrê ferq dike. Li Stenbolê di atolyeyeke biçûk de dest bi çêkirina lîrê dike. Gul ji bo pêvajoya lêgerîna xwe wiha dibêje: "Bi tu awayî heta vî temenî, di tu karî de min xwe wek hostayekî nîşan nedaye. Tim di nav lêgerîn, fikirandin û pratîkê de bûm. Ev yek di nivîskarî û mûzikjeniyê de jî ji bo min bi heman rengî bû. "

**Enstrumaneke jibîrkirî**

Muzîkjen Alî Eren Gul wiha behsa destpêka çîroka xwe û lîrê dike: "Gelek cureyên enstrumanê ji aliyê gelek kesan ve hatibûn çêkirin. Lê belê enstrumaneke ev qas dîrokî û dengê wê bi çêj hatibû jibîrkirin. Hem lîr enstûmaneke şîrîn e û kêfê dixe dilê mirov. Ya din jî enstrumaneke ku li ser erdnigariya me hatiye afirandin. Ji aliyê Lûvî, Sumerî, Misir û Yewnanan ve bi şikl û taybetmendiyên cuda hatine afirandin. Enstrumana hatiye jibîrkirin heta serdema osmaniyan jî hatine çêkirin, piştî wê tu pêwendî pê nemaye û gihîştiye dawiya emrê xwe."

**Bi hilberînan em li ber xwe didin**

Gul di axaftina xwe de bal kişand ser çêkirina lîrê û destnîşan kir ku ev enstruman herî dawiyê di dema osmaniyan de hatiye çêkirin lê belê li ser erdnîgariya osmaniyan hatiye afirandin ne diyar e û wiha pê de çû: "Di vê serdema modern de wek ez dizanim yekem kesê ku lîrê çê dike ez im. Lê rastiyek heye ku li vî welatî senteza hilberîn, afrînerî, huner û ya zanistê wek tiştekî nebaş e. Ji ber ku Tirkiye welatekî vasat e, welatekî ku di otelan de 33 kesan dişewitînin, welatekî ku bedena mirovan parçe parçe dikin. Li ser erdnîgariyeke bi vî rengî mirov dê nikaribe qala huner, zanist û filan tiştê bike. Lê em îro li hember vê hişmendiya qirker disa jî li ber xwe didin û diafirînin. Ez jî bo pêşerojê hê zêdetir biafirînim di rojên pêş de ez ê dest bi çêkirina lavta û tembûrê û hin amûrên din ên mûzîkê jî bikim.

Ji roja ku ez vê enstrumanê çêdikim; ji zarokan heta mezinan, ji kesên muzîkjen heta yên ku cara yekem enstrumanekî digirin destê xwe; eleqeyeke pir baş heye. Bikaranîna lîrê pir hêsan e jî."

Di dawiya axaftina xwe de Alî Eren Gul bal kişand ser têkiliya di navbera tembûr, gîtar û lîrê û diyar kir ku îro her kes ketiye pey saz û gîtarê û ev tişt anî ziman: " Saz û gîtar berê muzîkê bi gelemperî da terzekî erebesk û profîlên erebesk. Bi heman rengî pêvajoya çêkirina saz û gîtarê jî pir zehmet e. Li gel vê buhayê wan jî giran e. Jixwe buhayê gîtarê naye avakirinê, pir buha ye. Lê lîr hem dengekî qedîm û hem jî zêde ne buha ye."




Cejna we pîroz be!

MED TUHAD-FED

Bi hêviya rojên azad û xweş, em Cejna Qurbanê li hemû gelê xwe û bi taybetî li girtiyên zindanan pîroz dikin. Bi hêviya ku ev cejn bibe wesîleya, aramî û azadiyê. Em vê cejnê li hemû cîhana îslamê pîroz dikin.

Federasyona Komeleyên Piştevanî û Hiqûqê ya Malbatên Girtî û Hukumxwaran a Med'ê

xwebûn

19-25 Tîrmeh 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 83

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** Elif Can Alkan
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Kurdên cîhana dêrîn; hattî-hîtîtî





Keştiya Alalû

Agît Yazar

Xwînerên ezîz. Vê carê keştîya Alalû ew ê xwe li paytexta Hitîtan, li Hattûşa/Hattûşaşa xopan dayne û em ê bi hev re li xizmên xwe yên Hattî-Hitîtî biqesidin.

Bê çawa şik ji kurdbûyina kurdekî kelhor, goran, soran, kurmanc, zaza re tune ye. Şik û guman ji kurdbûyina yekî hîtîtî re jî tune ye. Ger hûn vê nivîsê û berdawamiya wê bixwînin, hûn ê jî jê re serwext bibin ku hîtîtî jî xas û hur kurdê reş ê mirî ye.

Belê, berê min li Hattûşayê ye, lê belê berî em daxilî paytext Hattûşayê bibin, werin em bi hev re li ser devê riya xwe dagerin bajarê antîk yê Alacahoyukê. Qet xwe jê venegirin û xwe xerîb nehesibînin. Lewra niştecîhên Alacahoyukê jî xizmên me yên hattî ne. Ew jî bi eslê xwe kurdên xas in. Bi gotineke din; niha gelek ji me em hattî yên xas in. Kî çi dizane. Dibe ku yê vê nivîsê dinivîse, an jî tu xwînerê niha vê nivîsê dixwîne jî dibe ku ji kok û reha hattîyên Alacahoyukê û Hattûşayê bin.

Alacahoyuk, bi qasî 35 kîlometreyan dikeve bakurê paytext Hattûşayê. Avakarên vî bajarê antîk yên yekemîn, hattî ne. Ev bajarê antîk, bi tirbên xwe yên bîrdarîyê, her wiha bi derîyê xwe yê bi sfenksî, navdar e. Her çiqas niha tirk ji vî bajarê dêrîn re dibêjin Alacahoyuk, lê navê xwe yê rastîn Arînna ye û ev nav ji hêla niştecih û avakarê wê yên pêşîn ve hatiye lêkirin. Ev navê Arînna, di heman demê de navê xwedawenda rojê ye.

Xwînerên ezîz. Binêrin em hîn di despêka lêkolîna xwe de, li bajarekî antîk rast tên û navê xwe xwerû bi kurdî ye. Arînna, di roja me de jî gelekî tê bikaranîn. Nexasim îro, em xelkên kurd, hîn û hîn jî vî navî li keçên xwe dikin. Heta kesên keçên wan gelekî li ber dilê wan şîrîn be, vî navî li keçên xwe dikin. Arînna an jî Arîn.

Gava ez di derîyê dîrokî yê bi sfenks re daxilî nava bajarê antîk dibim, hilma dem û dewranên dêrîn li ser çavê min dixîne. Bi hemû hest û hîsên xwe, meriv tê derdixîne ku meriv li nava xizmên xwe ye. Sura bayê wê atmosferê bi awayekî welê nazik xwe li meriv dipêçe, meriv dibêje ev ne ba ye; ev qumaşê hevîrmêş yê bi sabûn û gihayê bêhnxweş hatiye şûştin, veşûştin û xwe li ser bedena meriv, bi şîrgermî li ba dike.

Berê deriyê bisfenks li hêla rojhilat dinêrin. Li vî alî û li wî alîyê derî du heb sfenks hatine daçikandin. Gewdeyên sfenksan, gewdeyên şêran e. Lê serê wan di durfê serê jinan de ye. Kî çi dizane. Dibe ku ev sfenksên serî-jin, xwedawenda rojê Arînna bi xwe bin. Lewra riwayet ew e ku sfenksên jin, ji bo hefidandina bajêr li ber derî yê têketina nava bajêr hatine çikandin; daku bajarê xwe ji qeda ji bela û ji kesên bêyom biparêzin.

Li ser kêleka sfenks, teyrê duserî hatiye qewartin. Di nava her penceyekî teyr de, kîvroşkek tê dîtin. Dîsa li ser dîwarê li ber sfenksan, rolyefên hukumdar û yezdanên wan tê dîtin.


Berdewamiya dîwarê bi sfenksan ve, bi kevirên kujomijo, ango yên ne şehkirî hatiye lêkirin. Lê dîsa jî meriv dibêje qey bi lazerê hatine birîn û lêkirin. Wanî cilêt di ber re derbas nabe.

Tirbên heyî, yên keya û jinên navdar in. Di tirbên keyayan de mertal, şûr û tîrkevanên wan hatine dîtin. Her wiha di tirbên keyayên hattîyan de sembola rojê, bi tirkî jêre dibêjin "guneş kursu" hatiye dîtin. Ev sembola rojê ku li dora wê duwazdeh sembolên ji hev cuda, wekî pezkovî, teyr, dar û sembolên din pêvekirî tê dîtin.

Di tirbên jinan de jî xişir û tiştên wan yên xemlê hatine dîtin.

De me got, ev bajarên dêrîn yên hattiyan bûye. Ango berî hukumdarên hîtîtî werin, ev bajar hatiye avakirin. Loma jî dîroka van tirban, xwe dispêrin berîya 4 hezar- 4 hezar 500 sal beriya niha.

Ro li ber ava, ez ji Alacahoyukê vediqetim û berê xwe didim Hattûşaya paytexta hîtîtan. Di soringiya êvarê de, ez digihêjim Bogazkaleyê. Jixwe Bogazkale û Hattûşa bi hev ve ye. Nexşeya mezinahiya Hattûşayê, ji ya navçeya Bogazkaleyê bi gelekî mezintir e. Lema jî hotela turîstîk a navçeyê, gelekî hêsan tê dîtin. Digel konê min yê kampîngê li gel min e û cihê ji konên kampîngvanan re hatiye terxankirin jî heye, lê dîsa jî ez hez dikim wê şevê li hotelê razêm. Mexseda min ew e di der barê hîtîtan û Hattûşayê de, ez hinekî agahîyên di nava gelê herêmê de veşartî mane berhev bikim. Lewra ew agahî, ji dê û bavan derbasî kur û keçên wan bûye. Bi raya min ev agahiyên wanî, agahiyên parzûnkirî yên herî orjînal in.



Ji ber kêmbûna muşteriyan, gotin di cih de be, xwediyê hotelê li ber me li ser nenûkan direqise. Temenê xwediyê hotelê, derdora 60-65 salî ye. Ji çapana wî tê famkirin ku ew ji malbateke xuya ya wê navçeyê ye. Mêrik timî berê gotinê dadigerîne tîne li ser bavê xwe yê kal. Ez ji gotinên wî derdixînim ku bavê wî hîn li jiyanê ye û ew kalemêrekî xerîbdost e. Her ez dixwazim êdî rabim biçim odeya xwe ya razanê, lê xwediyê hotelê peyvê dirêj dike û bi hostahî min vediawiqîne.

Ez ê paşê pê bihesim ku bavê wî yê kal dê were hotelê li gel me û ew ê bixwaze hinekî bi me re bike galegal. Daku hinekî bêhna wî were li ber wî. Lê çima em, çima ne kes û kûsên wî, nas dostên wî?

Hîna ez li bersiva pirsa xwe digeriyam, min dît jîpek hat li ber me sekinî. Zilamekî kal lê bi dar û ber, ango yekî bejinbilind ji erebeyê peya bû. Guhên wî yên bel, bi zor di nava pirça sipî de dixuyan; hema ewqasî di nava pirçê de kifş dibûn. Lê bi eksê pirça kulx a guhê wî, serê wî tibabekî rût bû. Herwiha rî û simbêlê xwe jî kur kiribû.

Kalemêr, xwedî sekneke bi bandor bû. Me ji ber wî qam kir; em rabûn li ser xwe. Lawê wî em bi kalemêr dan naskirin. Gava destê xwe dirêjî destê min kir, bi zor kêsa min lêhat ku ez destê wî yên mîna melêveke darînî wanî gir, bijdînim û bihejînim.

Piştî xweşûbêşê em li hev rûniştin. Niha ez li ber dikevim bê çima kalemêr hevdîtina bi me re xwestibû. Lewra kalemêr, bi eslê xwe kurdekî Meletî ye. Kal û pîrên wî bi egerekê koçî vê derê kirine. Li ser gotina kalê Osman (bi vî awayî hûn ji navê wî re jî serwext dibin) çaxa kal pîrên wî ji Meletiyê koçî Bogazkaleyê dikin, ev der gundekî piçûk bûye. Lê niha jî navçeyeke berxweş e.

Kalemêr dibêje, ez damezrînerê vê navçeyê yê yekem im ku min ji gund derbasî statuya navçeyê kir û ez serokşaredarê wê yê yekemîn im.

Dibe ku haya kalemêr jê tu nebe. Lê bi rewşa xwe, her wiha bi helwesta xwe çiqas dişibe keyayê hîtîtan, Hattûşîliyê yekemîn.

Gelek Hîtîtolog yên bêlayen, hemfikir in ku keyayên Hîtîtan ji hozeke derdora navçeya Dîvrî ya Sêwazê ye û ev hozek ji wan hozên Xorrî/Horrî ye.

Tê gotin ku hukumdarekî ji vê hozê bi navê Anîta, B.Z di destpêka sedsala 17. de vedigere li ser paytexta hattîyan, bajarê Hat-û-şa yê, paytextê wêran dike. Paşê bi nifirên kesnedîtî, nifiran li Hattûşayê dibarîne. Paşê keya Anîta wiha dibêje:

"Şevekê ji nişkê ve min vegirt li ser Hattûşayê. Min bajar bi dar û berên wê hilweşand û da li ber pêta arê sor. Paşê jî min bizrê gihayê quruncokê lêbizar kir. Da ku kundê kor li şûna vî warî bixwîne û careke din ji tu kesî re nebe cih û mesken"

Lê digel vê nifira Anîta yê bapîrên keyayê hîtîtiyan jî neviyê wî Hatûşîlî, B.Z di sala 1650'î de tê paytexta wêrankirî ji nû ve ava dike û navê paytexta dêrîn li xwe dike; Hatûşîlî, tê wateya kesê ji Hatûşayê. Hatûşîlî, di heman demê de dibe keyayê binemala yekemîn yê hîtîtan.

De werin ji xwe re li vê lêrasthatinê binêrin. Piştî 3 hezar û 500 sal şûn ve, dîsa ji sêgoşeya Meletî, Dêrsim û Sêwazê malbateke kurd radibe dide rê û tê ji nû ve cih warên kal û pîrên xwe ava dike.

Kalê Osman, bi temenê xwe yê 83 salî fîncana qehwê li ser dest û ji min re tîne. Ji fediya re ez bi dev û rû diçim erdê. Bi dengekî nizm lê bi hêrseke mezin û ew çend jî bi berger, ez ji kalê Osman tika dikim ku min li ber şermê nexîne.

Ew jî bi dengekî bi qasî bejna xwe qebe û ew çend jî gur, di ser min de hiltê û dibêje: "Kuro lawo berxê min ma tu dibêjî çi! Nola dibêjin, bila kurd be, bila qe ji heriyê be. Ma ez xizmetê ji te re nekim, ez ê ji kê re bikim?"... ***(Dê bidome)***